

GUHERBARIYA ÇANDA DEVKÎ, XWEDÎTÎ Û EKOLOJİYA NERÎTÊ: JIYAN Û KILAMÊN EVDÊ ŞERÊ Û HESEN NAZÎ

Ömer Delikaya

Bingöl Üniversitesi

omerdelikayaa@gmail.com

0000-0001-6505-5107

Gönderilme Tarihi: 2 Temmuz 2025

Kabul Tarihi: 2 Aralık 2025

DOI: 10.26791/sarkiat.1732707

Guherbariya Çanda Devkî, Xwedîtî Û Ekolojiya Nerîtê: Jiyan Û Kilamên Evdê Şerê Û Hesên Nazî¹

Kurte

Ev xebat ku dide pey mîrasa Evdê Şerê (1870–1961) û Hesên Nazî (1889–1989), du birayên şair (dengbêj û destanbêj) ên ji bajarê Efrînê, dixwaze rola wan a di nav edebiyata kurdî ya devkî û veguhestina çandî de nîqaş bike. Bi vê meqsedê, jiyan, berhemên hunerî, repertuar û bandora wan a li ser şairên peyrewên wan, di çarçoveya girêdanên nav-malbatî yê xurt û pratîkên hînkirinê yê şagirtîyê de vedikole. Herdu birayên sazband û şair, ne ku tenê destanên kurdî bi tembûrê îcra kirin, lê herwiha afirînerî û hostatiya xwe jî nîşan didan bi wan kilamên ku bi xwe çêdikirin. Di vê xebatê de nezelaliya xwedîtîya kilameke herdu şairan tê nîqaşkirin û hin kilamên aidi wan jî tê destnîşankirin. Kilama “Xarzî Mihemed”, berhema hevpar a herdu şairan ku di gewher de li ser mirina xwarziyê wan hatiye çêkirin ji dengê Hesên Nazî hate bernivîsandin û bi awayekî berawirdî ligel varyantên di serdemên cuda de hate nîqaşkirin. Di varyantên kilamê de ku ji sala 1938an û vir de derketine holê, rengvedana tevgera Murîdan û veguherînên referansên erênî yê li ser Mustafa Kemal (Atatürk) çawa cih hêlaye bo Leyla Qasimê ku kesayetiyeke sembolîk a tevgera siyasî ya kurd e li Iraqê, wekî ji nû ve bicihkirinên îdeolojîk ên li gorî hestiyariyên siyasî û serdemî yê guhdaran rûdîdî, di çarçoveya têgeha ekolojiya nerîtê ya Honko de hate vekolandin. Di dawiyê de, ev xebat herdu şairan di çarçoveya wan a çandî de wekî aktorên afirîner bi cih dike û bi rêya hevpeyvînên derbarê pratîkên wan ên hunerî, muzîkî û repertuarê de, herwiha qeydên cihêreng ên dijîtal, perspektîfeke biyografîk pêşkêş dike.

Peyvên Sereke: Kurdî, Efrîn, Hesên Nazî, Evdê Şerê, Şairê gelêrî

Dönüşen Sözlü Kültür, Mülkiyet ve Gelenek Ekolojisi: Evdê Şerê ve Hesên Nazî'nin Biyografileri ve Kılamları

Öz

Bu çalışma, Suriye'nin Afrin kentinde (Kürt Dağı) halk şairi iki kardeş (*dengbêj* ve *destanbêj*) Evdê Şerê (1870-1961) ve Hesên Nazî'nin (1889-1989) sözlü edebiyat geleneğindeki biyografik profillerini ve kültürel

miraslarını irdelemektedir. Çalışma, şairlerin yaşamlarını, sanatsal külliyatlarını ve ardılları üzerindeki etkilerini nesiller arası aktarım ağları ve ustadan çırağa geçen öğretim pratikleri bağlamında incelemektedir. Söz konusu ozanlar sadece *tanbur* ile Kürt destanlarını icra etmekle kalmamış, aynı zamanda telif ettikleri çok sayıda *kilam* ile yaratıcı otoritelerini ortaya koymuşlardır. Makalede her iki şaire atfedilen *kılamlar* tespit edilmekte ve kılamların aidiyet meselelerine dair belirsizlikler tartışılmaktadır. Her iki şairin ortak yaratımı olarak ele alınabilecek ve özünde yeğenlerine yaktıkları bir ağıta dayanan “Xarzî Mihemed” adlı *kilam*, arşiv niteliğindeki eski bir ses kaydından deşifre edilmiş ve farklı dönemlerde icra edilen varyantlarıyla karşılaştırmalı olarak analiz edilmiştir. *Kılamin* 1938'den bu yana ortaya çıkan varyantlarında, Mürid hareketinin yansımaları ve Mustafa Kemal'e yönelik olumlu referansların yerini Irak'taki Kürt siyasi hareketinin sembol isimlerinden Leyla Kasım'ın (1952-1974) alması gibi anlatısal başkalaşımalar; dinleyicinin siyasi ve dönemsel hassasiyetlerine göre gerçekleşen ideolojik yeniden-konumlandırmalar olarak, Honko'nun *gelenek ekolojisi* kavramı çerçevesinde yorumlanmıştır. Sonuç olarak bu çalışma, her iki Kürt halk şairini kültürel bağlamda yaratıcı birer özne olarak konumlandırmakta; sanatsal, müzikal ve repertuarlarına ilişkin yapılan görüşmeler ve çeşitli dijital kayıtlar üzerinden biyografik bir perspektif sunmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Kürtçe, Afrin, Hesên Nazî, Evdê Şerê, Halk Şairi

Oral Culture In Transition, Authorship, and Tradition Ecology: The Biographies and Kilams Of Evdê Şerê and Hesên Nazî

Abstract

This study examines the biographical profiles and cultural agency of two brother oral poets (*dengbêjs*) from the Kurd Dagh region (Afrin) in Syria, Evdê Şerê (1870–1961) and Hesên Nazî (1889–1989). It analyzes the poets' lives, artistic corpus, and their influence on successors within the context of intergenerational transmission networks and master-apprentice lineages. Beyond performing Kurdish epics with the *tanbur*, both poets asserted their creative authority through original compositions (*kilams*). The article delineates the specific contributions of each poet while addressing complexities regarding authorship and claims of ownership. Specifically, the *kilam* “Xarzî Mihemed,” a collaborative lament composed for their nephew, was transcribed from an ar-

1 Reşnivîsa vê xebatê, bi navê “Afrinli Ozan Kardeşler: Evdê Şerê ve Hesnazi” wekî tebliğ di kongreya bi navê “IV. Uluslararası Dil, Düşünce ve Din Bilimleri Kongresi: Kişiler ve Eserler” (Mardin, 2024) de hatiye pêşkêşkirin.

chival recording and subjected to a comparative textual analysis alongside variants from different periods. Variants emerging post-1938 reveal significant narrative metamorphoses, such as references to the Murid movement and the supplanting of positive allusions to Mustafa Kemal with Leyla Qasim (1952–1974), a symbolic figure of Kurdish resistance in Iraq. These adaptations are interpreted through Honko’s concept of tradition ecology as instances of ideological repositioning responsive to the shifting political sensitivities of the audience. Ultimately, this study positions both oral poets as dynamic agents within their cultural context, reconstructing their legacy through interviews and diverse digital recordings.

Keywords: Kurdish, Afrin, Hesên Nazî, Evdê Şerê, Singer-poet

DESTPÊK

dilê mi rabû, bû ava asê
mi bang kir û kire gazî
li pîşa mi bû defter û yazî
mi xerbilandin pir şairê wekû Mişo Beko Berazî
ku wextêk werê ez ê bimirim
hûnê bêjin ka şairê mîna Hesên Nazî

Hesên Nazî (1889-1989)

“Wextêk werê ez ê bimirim, hûnê bêjin ka şairê mîna Hesên Nazî”. Ev bend aidî şairê² navdar ê Efrînê Hesên Nazî ye ku bi gazin li ser afirînerî û mîrasa li dû xwe gotiye. Îro, em dibînin ku wî di emrê xwe yê bi qasî sedsalekê dirêj de mîraseke xêr û xizne ji kekê xwe Evdê Şerê rakirîye³ û bûye dengêkî nemir di nav bîra civaka kurdî de. Ev xebat vekolîna mîrasa çandî ya du birayên şair û tembûrvan Evdê Şerê (1870-1961) û Hesên Nazî (1889-1989) bi xwe ve digire ku li Efrînê sermîyanekê gelek berfireh a edebiyata kurdî ya devkî sing bi sing dewrî nîfşên nû kirine û bi afirînerî û hostatiya xwe ya di tembûrjeniyê de jî naskirî ne. Malbata ku çend nîfşên wê di nav çanda kilambêjî û destanbêjiya kurmancî de tevkariyê xurt kirine, bi çend sedsalan di nav şair û sazkarên li Efrînê de wekî pêşengên vê çandê hatine hesibandin. Mixabin, ligel ku di afirînerî û sazkariyê de ew çend xurt bûn û xwedî tesîreke eşkere bûn li ser îcrakarên dawî yên li Çiyayê Kurmênc, nav û dengê wan li herêmên din bi rengê baş belav nebûye. Ev jî ji ber wê yekê çêbûye ku dengê Evdê Şerê negihîştîye roja me û Hesên Nazî jî piştî ku kurê wî di Herba Tîşrînê ya sala 1973yê de wêfat dîke, êdî bi eşq û meraqa xwe ya berê nade kilaman. Herwiha piştî ku ew herêm bi xeta sînorî ji aliyê netewe-dewletên nû ve ji hevdu hate qutkirin, kilamên nû yên vê deverê zêdetir di nav şair û sazbendên li Efrînê hatine vegêran û belav bûne.

Herêma Çiyayê Kurmênc ku dikeve bakur-rojavayê Suriyeyê, bi çanda kilambêjiya bi enstruman a qewî xurt û zindî xwedanê nirxekî taybet e di edebiyata devkî de. Ev xebat, bi nêrîneke giştî lîteratura çanda devkî ya vê deverê raçav dîke û torên danûstandinê yên di nêvbera îcrakarên edebiyata devkî de nîşan dide û wisa jî bi ser biyografi û sermiyana herdu navên pêşeng re dixwaze temsîla çandî ya vê herêmê raber bike. Xebatên biyografîk ên li ser îcrakarên çanda devkî tevî ku jiyana şair û dengbêjan, hevkarî û têkiliyên wan nîşanî me didin, pêwenda afirandina kilaman û dawakariyên li ser xwedî(lê)bûna kilaman jî radixin ber çavan –kilam aidî kê ye?– ku bi vê, taybetmendî û dînamîkên hunera devkî eyantir dîkin. Li ser vê esasê, dema ku meriv têkilî û jiyana şair û aşîqekî vedikole, meriv wê derfetê jî bi dest ve tîne ku pirs bike bê ka şairê/şaira berbehs kîjan kilam afirandine û bi demê re çend varyant ji wan peyda bûne û veguherînên varyantên kilaman –ku di maweya salên cuda de çêdibin– ên civakî, çandî û dirûvî çawa ne. Lewma ev xebata li ser jiyana û sermiyana Evdê Şerê û Hesên Nazî, lê dixebite tê derxe bê ka rola wan herdu îcrakaran li vê herêmê çi bû û tesîreke çawa li ser peyrewên xwe hêlan, herdu şairên berbehs hostatiyêke çawa bi nesla dû xwe re kirin. Ji bo berçavkirina sermiyana wan a xweser ku bi afirînerî û behredariya wan pêk hatiye, ew xebat li dû wan kilaman dikeve ku herdu şairan dahênane. Bi taybetî, “Xarzî Mihemed” ku bûye yek ji wan kilamên navdar û xwedan varyant, di vê xebatê de ji ber dengê Hesên Nazî hate bernivîsandin û veguherînên wê yên giring ên di varyantên nû de hatine nîqaşkirin. Kilama duyem a ku di vê xebatê de me berê xwe dayê “Lo Birawo” (Evdê Şerê) ye ku Hesên Nazî di sala 1961an de li ser mirina birayê xwe Evdê Şerê çêkiriye. Ev herdu kilamên nav-malbatî (li ser endamên malbatê ne) derfetê dide ku meriv di nav hewza nerîtê (*pool of tradition*) (bnr. Honko, 2000b) ya deverê de hêza afirîneriyê û berhemdariya hunerî ya şairan baştir rave bike.

Dema meriv lîteratura vê herêmê raçav dîke tê dît ku heta niha tu lêkolîneke musteqîl nîne ku li ser çanda kilambêjî û muzîkjeniyê li Efrînê bi awayekî berfireh hûr bibe. Berhema ewil û qeyda giring a ji vê deverê *Kurdische Texte* kitêba Albert von Le Coq e. Von Le Coq (1903) rojhilatnasekî alman, arkeolog û etnolog bû ku dema kolana arkeolojîk a Zîncîrlîyê li Islahiyyê dimîne hindek kilam û destanan berhev dîke. Pêwîste bê zanîn ew herêm ango rojavayê Kilîsê û navçeya Islahiyyê ya Entabê ji aliyê çanda xwe ya devkî û devoka xwe ve hevpariyê ligel Çiyayê Kurmênc

2 Di vê xebatê de me xwebinavkirina îcrakaran esas girt û di dewsa navê “dengbêj” de şair bi kar anî. Şair wekî navekî îcrakarên edebiyata devkî di nav kurdan de berbelav e û herwiha hin deveran bi taybetî ji bo wan kesan tê xebitandin ku dikarin bi xamî (îrtîcalî) kilamên nû bibêjin (bnr. Delikaya, 2025).

3 *Kilam rakirin*, têgehek e li vê deverê ku ji bo wergirtin û hînbûna kilaman ji hosteyan tê bikaranîn. Herwiha li vê herêmê, ji bo “kilama bibêje” dibêjin “bide kilaman”.

nîşan dide. Di lêgerîna lîteraturê de ji bilî xebata Mihemed Ebdo Elî (Elî, 2003) ku gelek bi kurtî behsa Evdê Şerê û Hesên Nazî dike, em rastî tu xebatê nehatin ku bi taybet li ser vê malbatê û mîrasa van herdu birayan hûr bibe.

Sînordariya vê xebatê nebûna çavkaniyên nivîskî ye; ji ber vê yekê zehmetiyên metodolojîk jî derketine holê. Ji ber nebûna çavkaniyên nivîskî di derbarê herdu birayan de, bi dehan qeydên deng û vîdeoyên cihêreng hatin teselîkirin ku li ser înternetê berdest bûn; parek ji wan wekî çavkaniyên sereke hatin bikaranîn ku tê de hin endamên malbatê li ser bav û kalên xwe xeber didan an jî agahî li ser kilaman didan (bo nimûne, bnr. Jindires, 2009; Tirej Afrin, 2019a; Abdo Abdulrahman Ebdê Şaerê, 2020; Nadim Ado, 2023). Ev çavkanî ji ber ku rasterast an jî nerasterast ji devê zarok û neviyên van herdu şairan bûn wekî çavkaniyên pêbawer û yekem hatin hesibandin û xebitandin. Helbet nebûna çavkaniyên nivîskî hinekî zehmetî derxist ji bo piştrastkirina zanyariyên devkî, ji ber vê hindê rêbaza çawaniyê (kalîtatîv) hate tercîhkirin ku tê de agahiyên berdest hatin şirovekirin û carinan jî ligel ên din hatin miqayesekirin. Pabendî vê rêbazê, me teknîka hevpeyvîna bi rêya telefonê bi kar anî, ji ber ku şerê navxweyî yê li Suriyeyê rê neda em herin xebatake sehayî li wir bikin.⁴

Kurte-Nêrînek li Lîteratur û Berhevkariyên Kurdî li Çiyayê Kurmênc

Herêma Çiyayê Kurmênc navendeke dewlemend a edebiyata kurdî ya devkî ye û bi taybetî ji aliyê çanda destanbêjiyê derdikeve pêş ku heta nika jî zindî maye. Yekem kesê ku bi berhevkariya xwe balê dikişîne li ser kilam û destanên vê deverê Albert von Le Coq e (1903) e. Le Coq di kitaba xwe ya bi navê *Kurdische Texte* vegêranên bi piranî kurt ji dorhêla Kilîs û Islahiyyê berhev dike. Ew wekî mêvanê Profesor Felix von Luschan beşdariyê li kolandina Zincîrliyê dibe di salên 1901-1902yê de, ew bi kurdekî re dibe nas û wî ligel xwe dibe Şamê û li wir ew ji devê wî bi mehan metnan berhev dike û li ser zimên dixebite (Kritzeck - von Le Coq, 1962, 116). Hêjayê gotinê ye ku pareke mezin a destanên di berhema Le Coq de hatine nivîsandin, di nav repertuara Hesên Nazî de jî cih digirin. Dema ku di destpêka 1900î de Le Coq metnên xwe berhev dike, Evdê Şerê wê hingê êdî şairekî di salên xwe yên berhemdar de bûye. Ango Evd û îcrakarên ku Le Coq jê berhevkarî kirine kêmkê de di heman dewrê de jiyane. Serekê ekîba kolandina li Zincîrliyê, Felix von Luschan jî dîsa di heman wextê de yekem dengên kurdî (Xelîlo Lawo û Lê Lê Mî Go) yên ji vê deverê/devokê jî tomar dike ku nika li Arşîva Fonografê ya Berlînê têne parastin (Kock û yd., 2004). Ji berhevkariyên ewil a duyem a nêzikî vê deverê (li Rihayê) ji aliyê Oskar Mann hatiye kirin ku tê de bi dehan kilam, destan û vegêranên li ser eşîran cih digirin. Kitaba bi navê *Our Steppe is Vast ...*: *Kurdish Epics and Tribal Stories from Urfa, 1906 Collected by Oskar Mann* ku ji aliyê Barbara Sträuli (2021) ve hatiye amadekirin, ne ku tenê metnên ewil ên edebiyata devkî yên ji vê deverê pêşkêş dike, herwiha baleke giring dide ser danûstandinên di navbera saz-bend û şairên ji Efrîn û Rihayê de jî (Sträuli, 2021, 32-35).

Ji bilî berhevkariyên Le Coq û Oskar Mann ên pêşeng, Celadet Alî Bedirxan û Roger Lescot jî ji vê deverê berhevkarî kirine. Bi taybetî Lescot berhevkariya destan û çîrokên kurdî kirine û ew di bin sernavên *Memê Alan* û *Textes kurdes* de weşandine (Lescot, 2013b; 1940/1942). Lescot di sala 1936ê de dest bi xebatên xwe yên qadê dike li Bakurê Suriyeyê di nav kurdên Êzîdî de (Tejel, 2011, 18). Bi vî rengî xebata wî ya bi navê *Enquête sur les Yézidis de Syrie et du Djebel Sindjar* (Lêkolîna Êzîdiyên Suriyeyê û Çiyayê Şengalê) di sala 1938ê de diweşe (bnr. Lescot, 1938). Serbarî van, ew li ser tevgera murîdan a dij-Fransayê ya li Kurd Daxê, monografiyeke kurt amade dike ku heta nika berfirehtir xebat e li ser vê tevgera civakî-dînî ya kurdan (Tejel, 2011, 18). Hêjayê bibîrxistinê ye ku tesîr û rengvedana vê tevgera murîdan di kilama Xarzî Mihemed a Evdê Şerê/Hesên Nazî de jî xuya dibe. Xêncî xebat û berhevkariyên wî yên li ser edebiyata devkî, wî herwiha pirtûka rêzimanê bi hevkarîya Celadet amade kir (bo zêdetir agahiyan li ser hevkarî û berhevkariyên wî, bnr. Lescot, 2013a, 7-11; Tejel, 2011, 18; Orak Reşitoğlu - Keskin, 2024). Lescot bi tevî Pierre Rondot, ji peywîrên xwe yên zanistî wêdetir, alîkariyên taybet kirin ji rewşenbîrên kurd re, bi taybetî ji Celadet û Kamiran Bedirxan re û wan bi awayekî çalak beşdarî li tevgera çandî ya kurdî kiriye (Tejel, 2011). Rola rewşenbîrên fransî yên wekî Roger Lescot û Pierre Rondot gelekî mezin bû di van weşanan de û bi saya van xebatan di qadên cuda de bingehek hat danîn (Orak Reşitoğlu - Keskin, 2024, 407). Ji bilî van xebat û berhevkariyên destpêkê, berhevkariyên din jî hene ku li Efrînê hatine kirin û derbarê hin navên sereke yên ji Efrînê agahiyan didin (bnr. Hemkoçer, 2013; Celîl, 2021; Yaş, 2016; Hatun Sürücü, 2024a, 2024b, Zeyno, 2023).

4 Parêzer û mamoste Ebdulwehab Ebdulhenan ku bi salan e deng û hunera gelek saz-bend, kilamci, kirif û şairên Efrînê ji nav xelkê berhev dike, di vê xebatê de ji me re bû alîkar. Bi taybetî dîroka salên jidayîkbûn û mirina herdu şairan wî ji bo me beyan kir û gelek pirsên min bersivandin. Ez ji dil û can spasiya wî dikim, mala wî ava be. Dîsa ez dixwazim spasiya xwediyê malpera Jindiresê bikim ku deng û rengên resen ên vê herêmê ji bo raya giştî parve dikin û diparêzin. Di vê xebatê de keda gelek kesan gihîştê min. Berê pêşîn, ji bo rastnivîsê dixwazim spasiya Halil Akgül û Zafer Açar bikim ku wan rênivîsa metna gotarê serrast kirin. Malavayî ji bo piştgirî û alîkariya Sevîm Hatun Sürücü, wê hem çend têbiniyên xwe ji bo min parve kirin, hem jî ji ber deng bernivîsa kilama Xarzî Mihemed kontrol kir. Herwiha spasiya Dr. Muhamed Zeyno dikim ku kitaba xwe ya bi navê *Dastana Şêx Seîdê Pîran: Lo Welato* bi min re parve kir. Divê keda hekemên Şarkîyatê jî ji bîr nekin ku ji bo pêşxistina gotarê û jinavbirina kêmasiyên wê pêşniyazên maqûl kirin.

Çiyayê Kurmênc û Danûstandina Îcrakarên Çanda Devkî

Bi giştî meriv dikare bibêje ku devera Çiyayê Kurmênc yek ji wan deveran e ku çanda destanbêjiyeke bi enstrumanî û kilambêjiyeke bi împrovîsasyonî ji mêj ve serdest e û kesên îcrakarên çanda devkî yên vê deverê ku xwe wekî aşîq, şair an jî kilamcî bi nav dikin, gelek zêde ne. Li ser dewlemendiya vê deverê Celîl destnîşan dike ku “Çiyayê Kurdistan, mintiqayeke çiyayî ye, etno-kultûrî ye. Edeba kurdên mira ye ruhanîyê materyalîyê ji bona kurdnasan, bê fitya, gelekî bi qîmet e” (Celîl, 2021, 14). Bi taybetî di salên 1980î de ku Celîl berhevkarî kiriye atmosfera sazbandî û kilambêjiya vê deverê destnîşan dike ku çanda tembûrçêkerî û tembûrjeniyê çendî li deverê zindî ye û li gorî gotina tembûrçêkiran ev çand ji zû de di nav kurdan de hebûye li vê deverê (Celîl, 2021, 14-15). Jixwe di warê tembûrê de navên gelek navdar derketine pêş ku meriv dikare bibêje kesê herî navdar û xwedî şîyanê ji nav wan Adîk e (1907-2007). Adîk ne ku tenê bi tembûra xwe navdar bû, wî digel ku bi xwe jî hindek destanên dirêj strane, gelek meqamên destanan wekî safî tembûr îcra kirine (bo tembûrjeniya wî ya destanan, bnr. Jinderes, 2021). Efrîn herçiqas nêzikî Kobanî, Serê Kaniyê, Qamişlo û Dêrikê be jî, bi repertuar, tembûrjenî û zaravayê xwe ji wan vedîqete û zêdetir nêzikî Kilîs, Islahiyyê ye. Herwiha civaka kurdên li Helebê bi kurdên Efrînê re yek in, ev yek ne tenê ji ber pevgirêdanên aborî ye lê di heman demê de jî ji aliyê çandî û cihanbîniya xwe ve jî vê yekîtiyê nîşan didin (Pinto, 2010, 4). Ji aliyê hevpariya çanda devkî ve meriv dikare bibêje ku sînor, Kobanî ji Sirûcê, Qamişlo ji Nisêbînê venaqetîne ji ber ku ji aliyê tarîxî ve têkiliyên eqrebatîyê di navbera wan de xurt e, hem jî sazband, dengbêj û mitirbên van deveran pir caran ji bo îcrakariyê, ji ber vexwendina nas û dostan an jî bi mebesta secilandina plak⁵ û kasetan derbasî jêr/jora xetê bûne. Lêbelê, plakên kurdî ku dengbêj û stranbêjên kurd li Suriyeyê dagirtine, demildest li Tirkîyeyê hatine qedexekirin û ji bo yekîtiya Tirkîyeyê wekî talûke û tehdît hatine dîtin (bnr. Yüksel, 2011, 91-95).

Dîwar û sînorên ku dû re hatin lêkirin di navbera netewe-dewletên nû avabûyî de, di kilaman de “wekî destwerdanên biyanî/derveyî li erdnîgariya kurdî tîr pêşkêşkirin” (Hamelink - Barış, 2014, 34) û piştî van sînoran jî çûn-hatinên xwecihên deverê her berdewam dike. Diyardeyeke din a ku berî avabûna netewe-dewletan tesîreke mezin hebû li ser xurtkirina danûstandinên çanda devkî, karê karwanîyê bû ku di veguhastina kilam û destanan ji Serhedê heta Helebê an jî berojavî vê yekê pêk dianî. Îcar ji ber ku gelek caran zarbêj û dengbêjên di karwanan de kilamên nû yên li rewacê hîn dibûn û ew dibirin nav cimaeta xwe ya guhdar. Ji kilamên dengbêjan jî tê dîtin ku li ser karwanan an jî ji ber tevgerên karwan û wergirtina baca ji wan, kilamên navdar derketine ku yek ji wan kilama bi navê Filîte Quto ye. Ev kilama ku xwe dispêre qewameke dawîya sedsala 19em li herêma Xerzan, bi çûn-hatinên karwanan re têkildar behsa şerê di navbera serokê eşîra Reşkotan Filîte Quto û serokê eşîra Etmanekîyan Emê Etmanekî dike û ev kilama li ser vî şerî bi şeweyeke nêzî destanê li ser devê dengbêjan belav bûye (Kevirbirî, 2000; Yorgun, 2024).

Têkiliyên di navbera îcrakaran de li Efrînê gelek xurt in, vê yekê hiştiye ku repertuara berfireh a destanan di nav nîşên nû de belav bibe, perwerdehiyên tembûrjeniyê di navbera hoste-şagirtan de çêbibe berî ku derfetên tomarkirina dengan tevkariyê li vê nerîte bike. Hunermendên edebiyata devkî li Efrînê hîn ji salên 1970î û vir de, bi saya serê kesên wekî Omer Fewzî (û dû re kurê wî Ferhad Omer Fewzî) ku xwediyê tescîla bi navê *Şerqil Ewsed* (Rojhilata Navîn) e, derfetê dibînin ku bi regekî profesyonel destan û kilaman tomar bikin. Ev yek tora têkiliyên hunerî û danûstandinên çandî di nav herêma de xurttir dike di dewreke wiha de ku êdî nesla dawî ya destanbêjên mezin ên herêma hîn li heyatê ne, yên wekî Hesên Nazî, Omer Cemlo, Adîk, Reşîdê Memçûçanê, Beytaz, Ehmedê Nêsirê Şemê, Eliyê Kapê, Cemîl Horo û hwd. Ev danûstandin piştî wextan tenê di nav Çiyayê Kurmênc da namîne, plak û kasetên ku hatine secilandin li ser bînxet/serxetê re derbasî aliyê din dibin. Bo nimûne, sazband û kilamciyê li Semsûrê Elî Dore (1952-2025) destnîşan dike ku wî tesîr ji Elî Tico wergirtiye (Sürücü Hatun, 2024b). Di nav aşîq, şair û dengbêjên kurd de têkiliyên ku bi cimaeta guhdar û îcrakarên din re çêdibin wê derfetê pêşkêş dikin ku meriv bi hûrbînî li ser vê nerîte bifikire û dînamîkên xasî deverê derbixe meydanê (Delikaya, 2023, 375). Lewma, dema xebatek bala xwe dide hûrkariyên li ser rehendên kêmnas yên çanda devkî û danûstandinên pir-awayî yên îcrakaran, wê hingê hindek xalên giring jî pê re eyan dibin. Bi taybetî, têkiliyên hoste-şagirtiye, xwedîtiya kilaman, çîrokên paşxaneyî yên afirandina kilaman, fikr û cihanbîniya kesê dengbêj û rêkarên ku îcrakar ji bo perwerdehiya şagirtên xwe bi kar tînin di vê behsê xwe xwedan. Jixwe bi hevdiştinên rû-bi-rû ku di wan de hejmara kesên guhdar jî bi sî-nordar e û her performansek bi awayekî kiryareke afirîneriya muzîkal e, bi xwe re cimaeteke guhdar derdixe hole. Lewma kilam û formên din ên muzîkal astengiyên zaravayan hetta yên zimanan diborin ji ber ku ew ji aliyê takekesên ji herêmên cuda cuda ve tîr hilgirtin (Blum - Hassanpour, 1996, 328). Sträuli têkiliyên di navbera sazbandên (şair/aşîq) û deverê de wiha terfî dike:

“Tora têkiliyên ku di navbera stranbêjan de hene helbet bi armanc pêk nedihatin, lêbelê ew têkilî bi awayekî adetî berfireh dibûn û teng dibûn bêhtir li gorî derfetên hunerî û aborî yên ku stranbêj didît ji bo hevdiştin û îcrakirina hunera xwe bi kesên

5 Cemîl Horo çend caran ji bo tomarkirina dengê xwe diçe Tirkîyeyê û hin kilam û destanan li wir disecilîne. Bo nimûne, ew ji bo şirketa bi navê Urfanin Sesi Plak “Memo Zîne” disecilîne (bnr. Yaş, 2016, 120-124).

din re. Lewma cihên ji bo civîn û kombûnan li dîwanxaneyên serokeşîran, qahwexane û odeyên gundan bûn ku di wan de lecên stranbêjan xurt bûn. Di destpêka sedsala bîstem de, cihên wiha koşk û û qonaxên serekên eşîra mîlan bû li Wêranşarê (an jî kon bû dema ku serekê eşîrê rêwîti dikir), li bajarê Rihayê, qonaxên serekên berazan li Kobaniyê, navçeya biçûk a Sirûcê, taxên kurdî yên li Helebê, herwiha Efrîn û gundên Çiyayê Kurmênc, ev listeya ku ji temamiyê dûr e, wiha dikare dewam bike” (Sträuli, 2021, 32).

Gelek têkiliyên xurt di navbera şair/aşiq/sazbendên vê herêmê de peyda dibin û helbet çûn-hatinên wan ên ber bi Kobanî, Qamişlo û Efrînê û ber bi ser xetê, Entab (bi taybetî ji bo tembûrçêkeriyê), Kilis û Xetayê çêdibin (R. Redwan, Pêwendiya Şexsî, Îlon 11, 2024). Ji ber ku berî ku sînor bê xêzkirin têkiliyên xizimî û eqrebatîyê jixwe hebûn. Îcar, li ser jiyana Evdê Şerê û Hesên Nazî de jî meriv dibîne ku wan bi dengbêj û sazbandên navdar ên dewra xwe yên wekî Mişo Bekebûr Berazî re kilam gotine û li hin dîwanxane û odeyên serekên eşîran de bi wan re ketine lecê. Jixwe di epîgrafa destpêka vê xebatê de jî Hesên Nazî vê yekê tîne ziman û xwe bi ser Mişo Bekebûr re dibîne.

Ji Gundê Aşiq û Şairan Du Pêşeng: Evdê Şerê û Hesên Nazî

Di vê sedsala borî de, Evdê Şerê û Hesên Nazî, du pêşengên berçav û navdar ên li Efrînê tesîreke mezin li ser şagirt û peyrewên xwe hêlane. Tesîr û şarezabûna wan ji aliyê şair û dengbêjên peyrewên wan ve hatiye îtîrafkirin. Afirîneriya wan û girêdana wan a saxlem bi nerîta şairî û muzîka gelêrî ya vê deverê re ew derxistine dereceyeke bilind.

Evdê Şerê (carinan wekî Evdoyê Şerê, Evdoyê Nazî an jî Evdê Milhesen) birayê mezin ê Hesên Nazî ye. Ew ji eşîra şikakî ne. Bi giştî agahiyên me derheq Evd de berteng in. Li ser sala jidayîkbûna wî lihevkirinek tune ye. Li gorî Mihemed Ebdo Elî ku di kitaba xwe ya bi navê *Cebel Ekrad* neqil dike ku navê Evdê Şerê, Ebdo kurê Ehmed kurê Mela Hesên e. Li gorî Mihemed Ebdo Elî jidayîkbûna Evdê Şerê tam ne diyar e, lê ew dîroka derdora salên 1890î destnîşan dike. Li gorî wî, kalikê Evdê Şerê Mela Hesên, ji gundê Çema yê bi ser Şerayê ve niştecîh bûye. Şerê, navê dapîra wî bûye û ji ber ku dapîra wî ew di zaroktiyê de xwedî kiriye, bi navê Evdê Şerê hatiye naskirin (Elî, 2003, 425).⁶ Evdê Şerê bi zimanê tirkî jî zanibûye û wî kilam û destanên wekî “Şêx Se’îd”, “Delal”, “Siyabend û Xecê”, “Memê Alan”, “Mihemed Emîn”, “Dax Dewran” gotine û derbarê repertuara wî de meriv dikare bibêje ku kilamên di nav malbatê de hatine gotin kêm-zêde hevpar in. Li gorî Elî (2003) wî kilama “Xarzi Mihemed” çêkiriye ya ku derbarê xwarziyê wî yê bi navê Mihemed Kalo de ye. Mihemed Kalo bi xwe jî wekî endamên din ên malbata hunermend û şair bi hunera kurdî ya devkî re mijûl bûye. Herwiha Evdê Şerê bi xwe kilama bi navê “Dax Dewran” û kilameke din jî derbarê axayê herêmê yê bi navê “Fayîq Axa Şêx Îsmail” de çêkiriye. Evdê Şerê aşiq û şairê dema Mişo Bekebûr Berazî (1889-1956) û Îbrahîmê Tirko (Îbrahîm Yûsiv) (1881-1961) û Şêx Simaq bûye û wî di dewra xwe de li Efrînê û derdora wê, bi hunera xwe ya resen deng vedabû. Wî di heman demê de zaf şagirt jî hînî kilam û destanan kiriye û ji ber vê yekê jî di nav şairên piştî xwe de nav û dengê wî gelekî xurt e. Bo nimûne, Wehîd Xelîl, tembûrvanê ji gundê Naza ji devê Mecîdê Hemgulî neqil dike ku wî li ser hînbûna kilaman ji Evdê Şerê wiha gotiye:

“Dibê ku Evdê Şerê biçûya kîjan gundî, e diçûm wî gundî. Mi dibihîst li ku derê ye e diçûm. O e dihatim yek niqla Naza ji cem gendî mi xew dikir, o go eva jî bi qedrê îlahî ye. Xwedê mêjîk daye min, gi Evdê Şerê bigota çî, da kilama Memê şeş saeta heft saeta kilama Memê go, wekî şirîdê bisecirînî go e gî disecirînim. Eva Mecîdê Hemgulî mi ra wer dibê. Ê mi go saeta te xwaş” (Hatun Sürücü, 2024, 45).

Kesekî din ê ku ji Evdê Şerê kilam rakirine, Reşîdê Memçûçanê (1924-2012) ye. Di hevpeyvîneke xwe de Reşîd destnîşan dike ku wî hem ji bavê xwe hem jî ji “Evdê Milhesen” kilam rakirine. Ew li ser vê yekê wiha hewêl dide:

“Istran min ji bavê xu rakir, yek. Ê Evdê Milhesen û Hesên Nazî hebûn min ji wan rakir. [Kilamciyê temam bûn ewna]. Bavkî min jî kilamci bû” (Tirej Afrin, 2019c).

Çawa ku tê ditin navên giring ên ji Efrînê yên wekî Reşîdê Memçûçanê û Mecîdê Hemgulî bi xwe tînin ziman ku wan parek ji kilamên xwe ji Evdê Şerê û Hesên Nazî rakirine. Bi vî rengî ew kesên ku dixwazin kilam û destanan hîn bibin an jî dixwazin tembûrê bielimin xwe li vî gundî girtine. Di nav kurdan de hin şair û dengbêj bûne navendên wekî dibistanan û li wan deran şagirtên xwe perwerde dikan. Çawa ku Gültekin (2013, 30) jî tîne ziman Mistefayê Xelê Heyran jî li Serhedê bi vî rengî şagirtên xwe perwerde kirine.

Helbet ji nav peyrewên Evdê Şerê, yê herî xurt û serkeftî birayê wî Hesên Nazî bû. Hesên Nazî jî destanên xwe bi piranî ji kekê xwe rakirin (E, Abdulhenan, Pêwendiya Şexsî, Çiriya Paşîn 11, 2025). Evdê Şerê di sala 1961ê de, piştî emrekî dirêj li gundê ku bi aşiq û şairên xwe ve navdar, bi rehma Xwedê şa dibe. Bi mîrasa xurt û afirîneriya xwe wî

6 Balkêş e ku ji aliyê binavkirinê û mexlesa wan a ku ji dayîk an jî dapîrê ji wan re mîras maye, serboriyên Evdê Şerê û Evdalê Zeynikê dişibin hevdu. Herwiha ji aliyê navên xwe ve jî hevpariya wan xaleke din a balkêş e.

kilam û stranên wisa li dû xwe hiştin ku îro ji aliyê bi dehan kesan ve tên îcrakirin û ji aliyê xelkê deverê û bi giştî ji aliyê kurdan ve tên guhdarîkirin û hezkirin. Mîrasa ku wî li dû xwe hiştiye di nav xelkê de hê jî zindî ye û ew gelek bi başî tê bibîranîn.

Du kurên Evdê Şerê hene ku parek ji kilam û destanan xwe ji bavê xwe rakirine: Henanê Evdê Şerê û Evdirehmanê⁷ Evdê Şerê. Herdu li ber destê bavê xwe û apê xwe yê navdar Hesên Nazî fêrî repertuara bavê xwe dibin. Ji ber ku têkiliyên di navbera pismaman de xurt e, endamên malbatê pirî caran di şevbihêrkan de civiyane û bi kilaman Evdê Şerê û Hesên Nazî bi bîr anîne (ji bo îcrakariya herdu lawên Evdê Şerê, bnr. Jindires, 2017; Abdo Abdulrahman Ebdê Şaerê, 2020 [1995]).

Hesên Nazî an jî bi kurtî û bi awayê ku di nav efrîniyan de navdar bûye Hesnazî di sala 1889ê de ji dayîk dibe. Hesên Nazî birayê biçûk ê Evdê Şerê ye. Jiyana xwe li gundê Naza yê navçeya Şerayê derbas dike û ji ber gundê xwe bi mexlesa Nazî ve navdar dibe. Ew hîn di zaroktiya xwe de bi mereq û eşq bala xwe dide ser hunera devkî ya kilam û destanan û heta dawiya emrê xwe vê hunerê îcra dike. Li gorî hin çavkaniyan ew piştî mirina kurê xwe yê bi navê Mihemed Nûr ku di Şerê Tîşrînê (6-25 Çiriya Pêşîn, 1973) de bi rehma Xwedê şa dibe, li ser kurê xwe kilamêkê çêdike û êdî kilaman nabêje û şairiyê diterikîne (bnr. Elî, 2003, 426; E, Ebdulhenan, Pêwendîya Şexsî, Çiriya Paşîn 11, 2025). Lêbelê qeydên wî yên kilam û destanan tên dîtin ku piştî wê salê hatine tomarkirin (bnr. Jindires, 2019b). Dibe ku piştî wefata kurê xwe wekî berê bi eşq û mereq nedabe kilaman. Hetta salek beriya mirina xwe, di sala 1988ê de, di 99 saliya xwe de li Sînemaya Xîratê ya li Helebê, jî cîvata dawetê re kilama xwe ya bi navê “Gulê Yarê” îcra dike ku wê hingê hunermendê ji Naza, Nûrî Şêxo (Bavê Mesûd) jî li kêlekê rûniştiye (ji bo qeyda vîdeoyê, bnr. Hassan Nazî, 2017).

Çawa li jorê jî hat gotin kurekî Hesên Nazî di Şerê Tîşrînê de wefat dike ku navê xwe Mehmed Nûr e. Kurê wî yê din Evdîlqadir e ku wekî Evdîlqadir Hesên Nazî jî tê nasîn. Meriv van agahiyan ji kurte-şîrên wî jî tê derdixe. Hesên Nazî ku xwe wekî aşîq û şair pênase dike, ji tradîsyona binavkirina ji ser kurên xwe ku di nav kurdên Efrînê de jî gelek xurt e, wiha qala xwe û herdu kurên xwe dike:

“Hesên Nazî go ez aşîq im, ez şair im

Bi qudret î, bi kebîr im

Axîr pir î, hesret kûr im

Gunehkar î pir qisûr im

Ez bavê Evdîlqadîr, Mehmed Nûr im” (Jindires, 2009, 1:50)

Evdîlqadir, kilamên tûras ên bavê xwe radike û mîna bavê xwe kedeke mezin dide çanda kurdî. Celîlê Celîl, bi ziyaretên xwe yên ji bo berhevkariya folklorê kurdî de di sala 1985ê de li bajarê Helebê derfetê dibîne ku kurê Hesên Nazî, Evdîlqadîrî nas bike û ji ber wî kilaman bigire. Li ser Evdîlqadir Hesên Nazî wiha dibêje:

“Ebdûl Qadir Hesên Nazî di sala 1938a li gundê Şera ya nehîya Şera ji dayka xwe bûye. Nika dimîne li bajarê Helebê, li taxa Şêx Meqsûd. Mehên havînê rojên xwe li gund derbaz dike. Dengbêj di temenê mezin da jî bi heyecan û bi kel destanên xwe digotin” (Celîl - Celîl, 2014a, 673-674).

Herwiha hêjayê gotinê ye ku Celîlê Celîl ji ber devê Evdîlqadir Hesên Nazî kilam/destana Meleknaz (Celîl - Celîl, 2014b, 564-573) û Arzî, Qember (Celîl - Celîl, 2014a, 338-354) bernivîsandiye. Celîlê Celîl di nava kilama Meleknaz de wêneyê Hesên Nazî daye lê bi şaşî di binê wêneyê wî de navê kurê wî “E’bdûl Qadir H’esen Nazî” nivîsiye (2014a, 564). Dîsa di nav kilama “Arzî, Qember” de ku jî devê Evdîlqadir Hesên Nazî hatiye bernivîsandin, wêneyê Hesên Nazî daniye lê di beşa kurtejiyana zarbêjan de jiyana Evdîlqadir Hesên Nazî nivîsandiye. Di vê behsê de diyar e ku wêneyê bi şaşî hatine bicihkirin. Celîlê Celîl diyar dike ku di repertuara Evdîlqadir de Mem û Zîn, Kerr û Kulîk, Dayîr Beg, Ês û Ezîz, Helîm Xatûn, Gureşê Mîrze Begê, Salihê Naso, Melek Naz, Memê Ewan, Usibî Şer, Dilî, Cebelî Axa, Huseyîn Begê Zilî, Guçik Hesên, Hesênê Alê, Arzî û Qember, Delal, Hey Can, Hey Lê Yarê, Meyrem, Suwarê lo lo, Xan, Gulê Yarê, Xarzî Mehmed, Herbê Tîşrînê, Elî Axayê Celemê, Heseno Pismam, Ceferê Qurbet, Şêx Seîd û yên mayîn hene (2014a, 673-674). Helbet, ev repertuar bi giştî ya endamên malbatê ye, bi taybetî ya Hesên Nazî û Evdê Şerê ye.

Ekrem Nazî (1968-), kurê Evdîlqadir Hesên Nazî hunermendek e ku nerîta xurt a malbatî bi sazbandiya xwe ve berdewam dike. Ew li ser herdu kalikên xwe Evdê Şerê û Hesên Nazî û rola wan a belavkirin û parastina çanda kurdî de wiha dibêje: “[Li] Çiyayê Kurmênc, Hesnazî û Evdê Şerê ne bes ji Êfrîn re distira ji hemû milletî kurd tev da ra distira. Çi li vê derê, çi li Tirkiyê, çi li Iraqê çi li Îranê li gi dera. Çiqa [kilam û meqamên] dîrokî hene gî distira gî bela

7 Awayê rast ê navê kurê Evdê Şerê “Evdirehman” (Evdirehmên) û kurê Hesên Nazî Evdîlqadir (Evdîlqadîr) ji qeydeke deng, li gorî bilêvkirina Henanê Evdê Şerê hatiye tercîhkirin (bnr. Tirej Afrin, 2019a).

dikir” (Arta, 2023, 43). Ekrem Nazî li ser rola herdu kalikên xwe ya di parastina çanda kurdî ya devkî de dibêje, nav û dengê wan li derveyî herêmê belav nebibe jî ji ber mîrasa ku neqil kirin û bi tembûrên xwe meqam veguhastin, wan “milletê kurd tev da ra” gotin ji ber ku ew mîrasa devkî ya hemû milletê kurd e. Tiştê din a ku ev malbat û herdu bira navdar dikir berdewamiya nerîta malbatî ye ji aliyê zarokên wan ên şair, tambûrvan û sazband. Henan û Evdîrehman, herdu lawên Evdê Şerê pareke biçûk a barê giran e mîrasa bavê xwe rakiriye, Evdîlqadir lawê Hesên Nazî jî li dû bavê xwe kilamên bavê xwe rakiriye û li dû şopa wî çûye.

Neviyê Hesên Nazî û kurê Evdîlqadir, Ekrem Nazî (Bavê Nazî) jî îro bi tembûrvanî û sazbandiya nerîti bi rengekî profesyonel berdewam dike. Ew bi awayekî xurt bi tûrasê bav û kalên xwe re girêdayî ye ku dema behsa xwe dike, li ser vê babetê dibêje “ez pîrî mereqlî bûm, ez pîrî eşqlî bûm, yanê min îbadeta ji Xudê berjêr ji tûrasê xwe ra dikir”. Dîsa ew li ser rakirina tûrasên bav û kalên xwe, bi vî rengî secereya xwe dide: “Va kara me rakirî, va saza, va dîroka va tûrasa ji bav û kala da. Ji Hesên Melhesen da, ji Ehmedê Melhesen da, ji Evdê Şerê da, ji Hesên Nazî da. Bavkî mi Evdîlqadir Hesnazî. Û ji wir derket Ekrem bavê Nazî, lawê Evdîlqadirê Hesên Nazî” (2020, *منتدى حلب الثقافي*). Tê dîtin ku malbat ev çend nîfşe bi mîrasa hunerî ya bav û kalên xwe re eleqedar e û giringiyeke berçav didine dewamdariya çand û muzîka nav-malbatî. Dema ku Ekrem Nazî yekem car di sala 1989ê de li pêşiya kalikê xwe li tembûrê dide, kalikê wî Hesên Nazî pê şa dibe û hêstiran berdide. Ji ber ku piştî kurê xwe Evdîlqadir, ew dibîne ku neviyê wî jî tûrasê bav û kalan radike û ew li ser vê yekê wiha dibêje: “ûcax kûr nare, ûcaxê me yê timî şên bî” (2020, *منتدى حلب الثقافي*). Korbûna ocaxê ku têgeheke giring e di adet û edebiyata devkî de, bi taybetî ji bo wê rewşê tê gotin dema ku zarokên kesekî çênebin ango kordûndebûn û war-reşbûnê îfade dike. Li vir em dibînin ku ev têgeh transferî rewşa dewama nerîta kilambêjî û sazbandiyê bûye ku jê bi berdewamî peyrew derdikevin. Pêwîst e bê behskirin, îro Ekrem Nazî li taxa Şêx Meqsûd a li Helebê karê tembûrjeniyê berdewam dike, tevî şer û pevçûnên dijwar ên ku van salên dawî li Helebê û gundewarê pêk hatine.

Çawa ku tê dîtin, Evdê Şerê û Hesên Nazî tesîreke mezin li ser zar û neviyên xwe çêkiriye û vê tesîrê hiştiye ku zarên wan jî bi vê hunerê re mijûl bibin. Ji bilî van, herdu bira eynî wekî Şêx Simaq û Îbrahîmê Tirko, ji şair û sazbandên din re bûne hoste û hindêk kesan xwe li gundê Naza girtine da ku ji wan kilaman û tembûrvaniyê bielimin. Dibe ku ji ber vê hindê be, ev gund li Efrînê bûye navenda perwerdehiyê û wekî “gundê aşîq û şairan” hatiye binavkirin. Bicî ye meriv bêje ev gundê navdar, li navçeya Şeraya Efrînê dimîne. Navê gund yê ji dema osmanî de maye wekî *Naz Uşaqî* ناز أوشاقي ye, dû re piştî ku tedîbê navê gundan çêdibe ji aliyê serdestên nîzamê Suriyeyê ve navê gund bi erebî dikin el Muhebbêbê (Çiyayê Kurmênc Official Mihemed Dîlber, 2020, 6:30). Ev gund ji berê û paş de bûye navend bo hunera tûras a kurdî li vê deverê. Bi taybetî malbata ku bi kilam û tembûrjeniya xwe ve merûf e ango Evdê Şerê û Hesên Nazî ku ji bav û kalên xwe Ehmedê Hesên, Hesên Mele Hesên de (Nadim Ado, 2023, *منتدى حلب الثقافي*, 2020) ev çand berdewam kirine, ji sedsala 19em û vir de tesîreke mezin li derdorên xwe hêlane. Ji vî gundî xêncî Evdê Şerê û Hesên Nazî, Ebû Îdrîs û gelek navên din jî derketine. Bi taybetî dîsa bi dû şopa bav û kalê xwe Evdîlqadir Hesên Nazî bi destanbêjiyê derketiye (bnr. Celîl - Celîl, 2014a). Navekî din ku dîsa bi heman rengî li pey mîrasa bavê xwe ketiye Henan e ku wekî Henanê Evdê Şerê tê nasîn. Henan bi tevî pismamê xwe Hesên Nazî îcrayên xwe yê destan û kilaman hene (bnr. Tirej Afrin, 2019a). Kesekî din e ji heman malbatê, Mihemed Kalo ku di ciwaniya xwe de diçe ber dilovaniya Xwedê û dû re li ser mirina wî kilama bi navê “Xarzî Mihemed” tê derxistin, yek ji wan aşîq û sergovendê dawetan bûye li vî gundî. Dîsa Ekrem Nazî (1978-), tembûrvanê ji heman malbatê, neviyê Hesên Nazî li Helebê kar û barên xwe yê hunerî didomîne (E, Ebdulhenan, Pêwendiya Şexsî, Çiriya Paşîn 11, 2025). Herwiha tembûrvanên ku bi gelek aşîq û şairên vê herêmê re tembûr lê daye ji bo destanên dirêj, Horîg û Wehîd Xelîl ji gundê Naza ne (bo zêdetir agahiyan bnr. Hatun Sürücü, 2024a). Hunermendekî din e ji vî gundî Nûrî Şêxo (Bavê Mesûd) ye ku kilamên Hesên Nazî û Evdê Şerê yê wekî Xarzî Mihemed îcra kirine. Çawa ku tê dîtin di du sedsalên dawî de, ev gund ji bo gelek şair û kilamciyên deverê re bûye navendeke perwerdehiyê an jî dibistana tûrasa kevn li temamiya Çiyayê Kurmênc û ji bilî herdu şairan gelek navên din ên biqîmet ji heman gundî derketine.

Mîrasa Hevpar û Nezelaliya li ser Xwedîtiya Hin Kilaman

Repertuarên herdu şairên bira, Hesên Nazî û Evdê Şerê ji ber veguhastinên çandî û nav-malbatî hevpariyeke zêde nîşan didin, ji ber ku ji bilî vegêranên ku aidî wan bi xwe ne, heman destan û kilamên tûras ji bav û kalên xwe rakirine. Lêbelê, ji ber ku Evd(o) hê di sala 1961ê de diçe ber rehma Xwedê, derheqê sermiyana wî de kêmtir agahî digihîjin ber destê me nisbet bi birayê wî Hesên Nazî ku sedsalek emir kiriye. Lewma herçiqas hin kilamên ku xwediyên wan diyar hebin jî di nav malbatê de, hin ji wan baş nayên zanîn bê ka aidî kîjan birayî ne. Ji ber vê hindê, meriv dikare hin kilamên vê malbatê di bin xwedîtiya herdu birayan de bifikire û binirxîne. Ji herdu birayan tenê dengê Hesên Nazî hatiye tomarkirin, dengê Evdê Şerê li gorî malûmatên berdest nehatiye tomarkirin.⁸ Hin îcrakaren nesla

8 Eger hatibe tomarkirin jî ji bo niha em aqûbeta dengê wî nizanin. Li gorî zanyariyên ku mamoste Ebdulwehab Ebdulhenan dide (Pêwendiya

nû û bi taybetî zar û biraziyên Hesên Nazî, dema ku kilamên aidî wî îcra dikin, di nava kilamê de navê Hesên Nazî tînin ziman ku bi vî rengî jî daner û xwediyê kilamê pê diyar dikin. Bi taybetî, kilama ku Hesên Nazî li ser birayê xwe derdixe ya bi navê “Lo Birawo” (Evdê Şerê) kilameke wisa ye ku tê de navê wî di serê çend bendan de nûbar tê hildan.⁹ Dema ku di sala 1961ê de birayê wî Evdê Şerê bi rehma Xwedê şa dibe, ew bi pey birayê xwe re kilameke bi navê “Lo Birawo (Evdê Şerê)” li ser wî derdixe/îcad dike. Kilama ku wî li ser birayê xwe gotiye li deverê belav dibe û nav û mîrasa Evdê Şerê di nav xelkê deverê de zindî dihêle. Henan lawê Evdê Şerê, kilama apê xwe Hesên Nazî îcra dike ya bi navê “Lo Birawo”. Kilameke dirêj e, bi tevî muzîkê qedera 30 deqîqeyan dikişîne. Berî ku Henanê biraziyê Hesên Nazî û lawê Evdê Şerê dest bi kilamê bikin, derbarê xwediyê kilamê û endamên malbatê de agahiyan dide û navê wan hemû kesan hildide ku li wê civatê hazir in:

“[Em] rûniştine li Çayê Seydo, Cebel Seydî li mala pismamê min Evdîlqadir lawê apê min Hesên Nazî bavê Hesên. Evî van gotininan dike Henan lawê Evdê Şerê, pismamê Evdîlqêdir. [Bavê Evdo] Herdu jî lawê aşîq û şairan e. Îca cimaetê me rûniştî lawê pismamê min Ekrem, Bavê Nazî ew jî hazir in, birakê min Evdîrehman bavê Mihemed ew jî cem me hazir in. Lawê min Evdo, ew jî hazir in. Va kilamê wexta bavkê min rehmetî, rehma Xwedê li tirba herdu aşîq û şaira bê, wexta jî dinyê bar kir dinya xwe degişmiş kir, apê minê rehmetî va kilama li ser îcat kir, çêkir va kilama. Sala 1962a. De be’ dî tu carî şûn da va kilamê me hîn negotî, em kê naha kilamê bibên” (Tirej Afrin, 2019a).

Çawa ji pêş-xeberdana di kilama Lo Birawo (Evdê Şerê) de jî Henanê lawê Evdê Şerê dide zanîn, ev kilama li dû mirina bavê wî jî aliyê apê wî Hesên Nazî ve hatiye “îcadkirin”. Di qeyda jorê de ku Henanê Evdê Şerê xeber dide û pê re bira û kurê apê wî kilamê dibêjin û biraziyê wî Ekrem Nazî jî li tembûrê dide. Di vê performansê de, hemû pêkve prosesekê pêşkêş dikin ku tê de hevkarîya afirandina kilam û muzîkê, bîranîn û enstrûman û tomarkirina deng cih digire. Ev çalakiya ku bi tevkarîya gelek kesan pêkhatî, tam jî bi têgeha Small (1998) a bi navê “musicizing” (muzîkanê/muzîkkirin) re li hev tê. Li gorî Small (1998, 2) di rastiya xwe de “muzîk ne tiştek e, lê çalakiyek e ku meriv wê pêk tînin.”

“Muzîk ew e ku meriv bi her awayî beşdarî performanseke muzîkî bibe, çi bi performansê, çi bi guhdarîkirinê, çi bi provakirin an jî pratîkkirinê, çi bi peydakirina materyalê jî bo performansê (tiştê ku wekî kompozîsyon tê binavkirin), an jî bi reqsê. Muzîk berî her tiştî çalakî ye” (r. 9).

Têgeha “muzîkkirin”ê an jî “muzîkanê” ne ku tenê performansê muzîkê li ber çavan digire, ew hemû wan çalakiyan bi xwe digire ku bi awayekî bi muzîkê re têkildar in, ên wekî hînkirinê, guhdarîkirinê û bîranîna muzîsyenan heta hewldanên jî bo tomarkirina deng. Ji ber vê hindê li gorî Small, “hemû çalakiyên ku tevkarîyê li prosesê dikin wekî çalakiya muzîkê tên teqdîrkirin û biqîmetkirin (1998, 12). Dema meriv tor û danûstandinên nav-malbatî yên şairan û lawên wan dinêre, meriv dibîne ku ji hînkirinê bigire heta bestekirina kilamên nû, performansên bi komî yên endamên malbatê û destnîşankirina xwediyên kilamê û bikaranîna mexles û navê aşîq û şairan di nav kilaman de hemû di nav prosesa afirandina muzîkê de rûdide. Endamên malbatê, her cara ku van kilaman dibêjin, destnîşan dikin ku kilam yekem car jî aliyê kîjan endamê malbatê ve hatiye gotin û bitaybet li ser çi rûdanê hatiye îcadkirin.

Schäfers (2019), di xebata xwe ya li ser dawakariyên xwedîtiya kilamên dengbêjan de jî têgeha Marilyn Strathern (1996) a bi navê “*qutkirina torê*” istifade dike û destnîşan dike ku mantiqa modern a mulkiyetê pêwîstiyê wisa pêş dixe ku ji bo aîdiyeta kilamê divê ew hemû tor û danûstandinên bêne “qutkirin”. Lêbelê, ji ber ku kilam xwe dispêrin veguhastîneke adetî ya silsileyî û hevpar, zehmet dibe ku meriv karakterên wan ên hevpar înkâr bike ku di her îcra-kariyê de nû de ji nû ve dikevin nav veguherînekê (Schäfers, 2019, 90). Ji ber vê hindê, nelihevî û nediyariyên li ser xwediyên kilaman derdikevin meydanê. Schäfers bi taybetî bala xwe daye dengbêjên jin ên herêma Serhedê û nîqaşek li dor xwedîtiya kilaman kiriye ku tê de hin dengbêjên jin jî bo hin kilaman dibêjin “ev ya min e”.

Dawakariyên xwedîtiya (*claiming ownership*) kilaman di nav malbata berbehs de zêdetir jî aliyê endamên malbata şairan ve hatiye/tê kirin. Bo nimûne, Henanê Evdê Şerê di pêş-xeberdana xwe ya kilamê de dibêje “Va kilamê wexta bavkê min rehmetî, rehma Xwedê li tirba herdu aşîq û şaira bê, wexta jî dinyê bar kir dinya xwe degişmiş kir, apê minê rehmetî va kilama li ser îcat kir, çêkir va kilama” (Tirej Afrin, 2019a). Malbat bi taybetî li wan kilaman xwedî derdikeve, yên ku endamên malbatê çêkirine ango “îcad” kirine. Ji bilî van hewldanên xwedîtiyê, dema ku zarên Evdê Şerê û Hesên Nazî kilamên bavê xwe an jî apê xwe dibêjin, mexles an jî navê wan jî li kilamê zêde dikin. Ji bilî wan jî kesên wekî Elî Tico jî dema ku stranê dibêje navê herdu xalên Xarzî Mihemed tîne zimên:

Şexsî, Çiriya Paşîn 11, (2025) qeydeke biçûk a dengê Evdê Şerê berdest bûye, lê mixabin ew jî ji ber rewşa aloz a salên dawî li Efrînê, wînda bûye. Wê wextê deng kêr dihatin tomarkirin. Bo nimûne, dengê Mişo Bekebûr Berazî (1889–1956) ku hevdemê Evdê Şerê ye, jî aliyê Stig Wikander ve hatiye tomarkirin, bo qeydê bnr. Alano Rewan (2012).

9 Di dengbêjiya Serhedê de jî şagirt û peyrewên Evdalê Zeynikê di kilamên Evdal de navê wî hildidin, bi taybetî di destpêk û serbendan de: “Evdalê Zeynê dibê” an “Evdal dibê”. Bi heman rengî di kilama “Lo Birawo” de, peyrewên Hesên Nazî wiha dibêjin: “Hesên Nazî bang kir go”, “Hesên Nazî go”. Nav û mexlesên kilamên kurmancî piranî di serê kilamê de an jî di serbendan de cih digire. Ji bo dengbêj û şairan beshkirina navê daner û xwediyê kilamê, di wê qadê de otorîteya wan kesan nîşan dide û di her performansê de dibe îmzeyeye performatîf.

“ê de roya tu ketî doşeka mirinê, balê xu bidê

xalên te **Evdoyê Nazî** û **Hesnazî** li ber balgî serê te sîkinîne

hêstirên xwunî ser başê te da dibarînin wek tava biharê gîşirtiya baranê”

(Tirej Afrin, 2019b, 10-11).

Çawa ku ji vê nimûneyê jî tê dîtin, dengbêj û sazbandên din ên ji vê herêmê dema ku vê kilamê dibêjin, li ser xwediyên kilamê yên ewil gotinên xwe dikin yek û heqê wan teslîm dikin, beramberî vê yekê, di kilamê de guherînên bingeîn çêdikin. Di vê behsê de, Elî Tico dema Xarzî Mihemed îcra dike, kilam xwe digihîne 44 deqîqeyan. Ev yek jî asta guherîn û împrovîzasyona Elî Tico nîşan dide, ji ber ku yek ji xwediyê kilamê Hesên Nazî bi xwe kilamê ligel tembûrê di 10-15 deqîqeyan de diqedîne. Hesên Nazî nav an jî mexlesa xwe (Bavê Mehmed Nûrî an jî Bavê Evdo) li kilama Xarzî Mihemed zêde nake, lê peyrewên wî vê yekê dikin. Herwiha dema endamên malbatê kilama wî ya bi navê “Lo Birawo” dibêjin, dîsa navê Hesên Nazî lê zêde dikin. Ev yek di heman demê de hostetî û otorîteya wî di nav îcrakaren vê edebiyatê de piştrast dike.

“herê herê dîsa **Hesên Nazî** bang kir go

lo hev havîn e xweş havîn e

lo birawo go lo hev havîn e xweş havîn e

êş û şewetê keko bira kes nebîne

dinyê neman rabûn Yusuf û Qarûn e” (Tirej Afrin, 2019a)

Hindek kilam hene ku ji aliyê malbatê ve an jî ji aliyê derdorên wan ve bi wan tên nisbetkirin. Herçiqas endamên malbatê heman kilamên bav û kalên xwe gotibin û her carê û her kesî bi terza xwe gotibe jî hin kilam diyar in ku Evdê Şerê û Hesên Nazî yekem car gotine. Hetta li mala kurê Evdîlqadir Hesên Nazî û dû re jî mala neviyê wî Ekrem Nazî wêneyekî çarçovekirî yê herdu birayan xuya dike ku di navbera wêneyê wan de navên wan kilaman hatiye nivîsîn ku ji aliyê Hesên Nazî û Evdê Şerê ve hatine derxistin/îcadkirin (bnr. Pêvek 4). Ev wêne bi xwe belgeyeke saxlem e ku li beramberî serdestiya anonîmbûnê meydanê dixwaze û herdu şairan wekî afirînerên çalak ên vê çandê destnîşan dike. Serbarê vê, wekî ku belgeyeke telîfê an yê mulkiyeta çandî be “torê qut dike”, wate xet û sînorekê datîne di nêvbera xwe û kilamên ji hewza nerîtê ya bîbînî ku tê de bi hezaran rûdan, varyant û îcrakar cih digirin. Li hember guherbariya çanda devkî, sabîtbûna dîtbarî ya nivîsê (listeya kilaman) xwediyên kilaman beyan dike û wisa jî dibe belgeyeke hostatî û şarezayîya herdu birayan. Di navbera herdu birayan de, afirîner/xwediyê hin kilaman bi temamî zelal nîne û ji ber vê bi şeweyekî vebirr nayê zanîn. Ev babeta ku kîjan kilam aidî kê ye, gelek caran yekser ji aliyê îcrakaren peyrew ve tê diyar kirin. Bo nimûne, di paş-xebera kilama Şêx Seîdê Pîran de, piştî Mecîdê Hemgulî kilamê dibêje tembûrvanê wî Wehîd Xelîl li ser çêkirina kilamê wiha xeber dide:

“Ma kanî, kanî? Leylayê Qasê Heso, Şêx Seîd Bavê Elî Riza, Qadî Mihemed kanî? Milet, ji zaroyê xu ra xeber din, ez ban we dikim bê şa’ir. Hineka herin wek Cemîl Horo rehmetî, Ebû Mesûdê rihmetî, Hesnazîyê rihmetî, Evdê Şerê rihmetî. Evina gi rihmetî bûn. Sazkar bûn. *Di şevêkê da Şêx Seîd bi dar xistin, di wa şevê da Evdê Şerê çêkir va kilamê Şêx Seîd*, me’nê hinda nebê li nav miletê kurd tev da, di arşîfê kin” (Jindires, 2022, 57).

Wisa diyar dibe ku Mecîdê Hemgulî ji hosteyê xwe Evdê Şerê hîn bûye ku ev kilam berê pêşîn wî derxistiye. Di kitaba *Dastana Şêx Seîdê Pîran: Lo Welato* de ku ji berhevbariya varyantên kilama li ser Şêx Seîd pêk hatiye, Muhammed Zeyno diyar dike ku kilam aidî Hesên Nazî ye digel ku hin çavkaniyên wî ji Kobaniyê kilamê aidî Mişo Bekebûr Berazî dibînin û destnîşan dikin ku ew ji Kobaniyê derbasî Efrînê bûye (Zeyno, 2023, 35). Tê zanîn ku herdu şairên bira jî bi Mişo Bekebûr re kilam gotine di dîwanên axa û began de. Di heman kitabê de lêkolîner Heyder Omer dibêje “yekemîn car ev destan bi deng û peyvên rehmetî Evdê Şerê hate strandin, û bi strandina birayê wî rehmetî Hesnazî (Hesên Nazî) li Çiyayê Kurmênc belav bû” (Zeyno, 2023, 4). Çawa ku tê dîtin babeta xwediyê kilama Lo Welato de jî nediyarî derketine meydanê ku pêdiviya vekolandinên zêdetir heye.

Çawa li jorê jî hate gotin, nezelaliya xwediyê hin kilaman heye. Kilama Xarzî Mihemed jî carcaran dikeve nav vê nediyariyê. Endamên malbatê yên wekî Ekrem Nazî (Mahmoud & Dunia, 2020, 2:30) û bavê wî Evdîlqadir Hesên Nazî aidiyetê didin Hesên Nazî (Jindires, 2009), lê hin kes jî îdia dikin ku ev kilam a Evdê Şerê ye (bnr. Eli, 2013). Ya baş û maqûl ew xuya dike ku meriv babeta xwedîtiyê de herdu birayan wekî hev-xwediyê kilamê binirxîne û wêneyê çarçovekirî yê li mala Evdîlqadir Hesên Nazî jî wekî delîla vê tiştî bifikire. Ev babeta xwediyê kilamê her çi be, xencî skeletê kilamê û hin temayên sereke yên vegêranê her kesî li gorî xwe kilam jî nû ve ava kiriye ku ev jî asta împrovîzasyona li vê herêmê nîşan dide. Danûstandina li ser kilama Xarzî Mihemed û ji aliyê şair û kilamciyên herêmî ve ji nû ve hilberandina vegêranê li ser esasê wê yê tematîk û hin xalên wê yên sereke, meriv dikare di çarçoveya “hewza nerîtê” (*pool of tradition*) ya Honko de bifikire. Hewza nerîtê têgeheke îşaretên kome-zanyariyên derbarê edebiyata

tradîsyonel de ye ku ji aliyê komêk merivan ve tê parvekirin. Endamên vê koma merivan dikarin tiştan lê zêde bikin an jî dikarin jê derxin (bnr. Honko, 1998, 70).

Li gorî Mehmûd Mihemed Elî, kilamên Hesên Nazî ev in: 1) Şêx Seîdê Kal, 2) Gulê Yarê, 3) Hey Yarê, 4) Ehmedê Şîrtî (Ehmedê Esker), 5) Hec Welo, 6) Zêneba Osê, 7) Ebdoyê Şerê (Lo Birawo), 8) Heseno Pismam, 9) Xana Dinê, 10) Xarzî Mihemed, 11) Axê Celemê, 12) Herba Tişrînê ye. Mehmûd bi xwe tescîla bi navê “Rabee” (ango bi erebî Bihar) ava dike û di wir de dengê Hesên Nazî jî tomar dike. Li gorî M. Mihemed Elî bi ser hevdu Hesên Nazî 66 saz (kilam) gotine (Mahmoud & Dunia, 2020, 1:09) û li ser afirineya wan wiha dibêje:

“aîlê Hesnazî, kalê delal, mîrasê bi wan re heye. Ekrem ji bavê xwe rakirî, bavê Ekrem ji bavê xwe rakirî, Hesnazî ji kalê xwe rakirî, vanî. Gavê ku Evdê Şerê û Hesên Nazî, her du jî rehmetî ku li hev rûdiniştin, saz dikirin¹⁰, şor ji cem xwe de çêdikin. Bi xwe him şair bûn, him bi pêçiya lê dixistin, him jî saz û lehn cem xwe de çêdikin” (Mahmoud & Dunia, 2020, 1:06).

Pareke mezin a tomarên dengê Hesên Nazî li ser înternetê peyda dibin, lê gelek kilamên ku aidî wî ne ji dengê wî peyda nabin. Bo nimûne, kilama wî ya “Lo Birawo” bi dengê wî nehatiye tomarkirin an jî ev deng heta niha nehatiye belavkirin. Wekî gotina dawî li ser xwediyên kilaman, zêdetir xebat gerek dike. Bi dû gotina Finnegan (1977, 201-206), divê em wisa nehesibînin ku kilam an jî cureyeke din a helbesta devkî tenê ji ber ku devkî ye, teqez “anonîm” e û aidî hemû civakê ye. Nasîna danerê takekesî taybetmendiyeke gelek çandên devkî ye, herçend di maweya demên dirêj de dibe ku navê xwediyê eslî ji bîr bibe.

Varyantên “Xarzî Mihemed” û Veguherînên Sosyo-polîtîk

Kilama Xarzî Mihemed an jî Xwarzê Muhemed ku li ser torên medyayê bi awayên cuda cuda meriv dikare bibîne, kilameke kevn e ku di sala 1938ê de ji aliyê Evdê Şerê an jî Hesên Nazî ve hatiye derxistin li ser xwarziyê wan. Ihtimaleke mezin herdu birayan jî di afirandina ewil a kilamê de cih girtine. Evdê Şerê ji ber ku zû dimire, tu qeydeke wî ya bideng a vê kilamê berdest nîne. Ji sala 1938ê û vir de, li gorî qeydên bideng ên kilamê ku piranî piştî salên 1970yî hatine tomarkirin, îcrakaren li Efrînê ev kilam gotine û qismek ji wan qeydan jî bi tembûrê, tenê saza wê ango besteya wê lê xistine. Li gorî qeydên berdest heta niha gelek kesan li Efrînê ev kilam îcra kiriye. Li Efrînê di nav îcrakaran de her cara ku kilam hatiye gotin, veguherînên bingeînê tê de çêbûne ku meriv dikare wan wiha rêz bike; beyanên li ser xwedîtiya kilamê û destnîşankirina navê şairan, awayên vegêranê yên cuda ku behsa tevgera Murîdan dikin, gotarên polîtîk û neteweperwer, guherîna navên navdaran (ji Mistefa Kemal berev Leyla Qasim) û guherînên din ên naverokî. Her cara ku ji aliyê kesekî nû ve ev kilam tê gotin, tê dîtin ku kilam kirasekî nû yê dewra îcrakar ji xwe re difesilîne û ji cihanbîniyên nû re deriyê xwe vedike.¹¹ Bi demê re, kilam dibe vegêraneke tim li guherbariyên nû yên di civakê re li hev dike, ji bo wan zemîneke hazir dabîn dike ku tê de xwestekên dilên şairan û êşa hevpar a civakê tev li şîna taybet a Xarzî Mihemed dibe.

Meriv dikare van veguherînên di nav kilamê de li ser têgeha Lauri Honko a bi navê “ekolojiya nerîte” (*tradition ecology*) şirove bike. Li gorî Honko dema ku nerîtên devkî yên wekî destan û kilaman derbasî rewş û dorhêlên nû dibin an jî bi demê re pêrgî hin şert û mercên civakî yên nû tên, ji bo ku hebûna xwe biparêzin adapteyî rewşên nû dibin. Ekolojiya nerîte, teorîyeke giştî ya çandê ye ku amrazan dabîn dike ji bo têgehkirina çawa naverokên çandî ji pêwendekê ber bi pêwendekê din diguherin, û çawa pêwend, fonksiyon û bikaranîna wateya van naverokan diyar dikin (Kamppinen, 2014, 4).

Dengbêj û şair jî li gorî hesasiyetên civata xwe ya guhdar berhemê beralî dike bi ser gotarên minasib. Di van veguherînan û varyantbûna de kilama ku her carê ji bo xwe kirasî nû difesilîne di heman demê de nîşan dide ku kilam wekî berhemeke zindî bi dorhêla xwe re tim di nav hevkarîgeriyekê de ye. Bo nimûne, Teverga Murîdan ku qewameke giring e di dîroka nêzik a Efrînê de, tesîrên wê di kilama Xarzî Mihemed de xuya dibin. Xarzî Mihemed (Mihemed Kalo) di sala 1938ê de dimire ku wê salê şerê Murîdan û fransîzan li deverê gurr bûye. Jixwe ev tevger di sala 1939ê de diqede. Teverga Murîdan di navbera sala 1936 û 1939ê de li Efrînê çalak e û ji aliyê parek eşîrên kurdan ve tên piş-tgîrîkirin. Ev tevgera dînî-civakî ya ku li hember rêveberiya mandayê ya fransî ye, di dewrekê de pêk tê ku Tîrkiye lê dixebite ku Xetayê daxilê erdê xwe bike. Teverger ji aliyê tirkekî bi navê Şêx Îbrahîm Xelîl (Soğukoğlu) ve tê rêvebirin

10 Saz di dewsa kilamê de li Kobaniyê tê gotin, ji ber ku Mehmûd ji Kobaniyê ye bi termînolojiya devera xwe bi kar tîne. Herwiha li vê deverê ji bo kesên kilambêj jî sazband tê gotin ku bi piranî bêtî enstruman dibêjin.

11 Li gorî qeydên berdest meriv dikare destnîşan bike ku navên ji vê herêmê yên wekî Hesên Nazî, Îbrahîm, Reşîdê Memçûcanê, Nûrî Şêxo, Cemîl Horo, Mecîd Hemgulî, Muhammed Elî Tico, Fethî Cemîl (tenê saz), Ehmedê Xanî, Qufê Şahîn, Ferman Awaz, Siyamend Efrîn, Elî Cemîl Horo, Ekrem Nazî (tenê saz), Adîk (tenê saz), Wehîd Xelîl (tenê saz), Dunia Kemal, Telet Memo (tenê saz) û hwd. ev kilam îcra kirine. Ji van navaan jî diyar dibe ku ev kilam li vî deverê hatiye hezkirin û şairan xwestiye bibêjin, tembûrvanan xwestiye meqamên wê lê bixin.

û çend salan tesîreke mezin li ser vê herêmê çêdike. Di vê derbarê de, xebata bi navê *Le Kurd Dagħ et le mouvement Mouroud* tekane monografiya berfireh e ku ji aliyê Roger Lescot (1940/1988; 1993) ve hatiye amadekirin.

Li gorî zanyariyên berdest ku Evdîlqadir Hesên Nazî dide, Hesên Nazî di wexta rêveberiya fransiyan de milîs bûye (bnr. Zeyno, 2023, 12). Yanê meriv dikare bibêje ku du alî hene wê demê, yek alîgirê murîdan, yek jî alîgirê fransiyan ku wekî milîs jî tên zanîn. Di varyanta kevn a Îbrahîm de tesîra wê bûyerê wiha derbas dibe: “bila ban milîsê me kurmanca gîya kin, bila werin nan û xweyê li gelek Mihemed helal kin” (Jindires, 2021). Ji vê yekê diyar dibe ku kesê ku şîna Mihemed digirin alîgirê milîsan e (fransiyan), bi ihtimaleke mezin eqreba û bi taybetî herdu xalên wî Evdê Şerê û Hesên Nazî ne. Li vir xuya dike ku terefgiriya fransiyan li ba şairan heye ku qeydên kevnê wê yekê nîşan didin.

Varyanta berdest a Hesên Nazî (Jindires, 2017) ku di heman demê de ligel birayê xwe xwediyê kilamê ye, navê tevgêrê tê de derbas dibe. Di nav varyanta Hesên Nazî de milîs bi xwe nînin, lê behsa teşkilata murîdan dibe ku çawa zirar gihandine gundê Naza:

“hawar ev çito xişm û xezebê Xudê bû ji me ra

ji **teşkilat ilma murîda**

xarzî temam gundê me yî Naza zalima şewitandin ar berdanê”

(bnr. Pêvek 1).

Çawa ji vê benda kilama Hesên Nazî jî diyar dibe, “teşkilat ilma murîda” ar berdane gundê Naza. Ev yek delîleke rasterast e ku di vegêranê de alîgirî ji bo teşkilata ilma murîdan nayê nîşandan û bi xerabî behsa wan tê kirin. Ihtimaleke mezin sebebê wê yekê bi paşxaneyê milîsbûna şair re pêwendîdar e. Herwiha di varyantên Cemîl Horo û Mecîdê Hemgulî de jî xerabî nîşandana tevgera murîdan xuya nake. Lê di varyanta Nûrî Şêxo de, meriv dibîne ku behsa murîdan tê kirin û Nûrî Şêxo bi xwe jî gundê Naza ye. Nûrî Şêxo derheqê şewitandina gundê de wiha dibêje: “ê de mi go ji wê bi şûn de teşkîla hizbê murîdan çêbû li binyana gundê me yê Naza, ji alî xerbî de gazyax kirin ar berdanê” (Ferhad Omar Fawzy, 2023). Berovajî navên li jorê, di varyanta Elî Tico de jî bo şewitandina gundê Naza fransî tên sêdarkirin. Elî Tico guherîna bingeşê di kilamê de çêdike û kilama ku varyanta Hesên Nazî 10 deqîqe dikişîne, di varyanta Nûrî Şêxo de dibe 35 deqîqe û di varyanta Elî Tico de bi tevî gelek hêmanên nû û muzîkê ve dibe 45 deqîqe. Di nav şairên Efrînê de jî heta salên 1970-80yî piştgir û peyrewên şêxan hebûn, parek ji wan şair û sazbandên navdar ên deverê bûn. Bo nimûne, Cemîl Horo û Mecîdê Hemgulî wextekî dibin murîdê Şêx Xelîl (Hatun Sürücü, 2024a, 44). Wate, derdor û danûstandinên îcrakar tesîrê li vegêrana wî û carcaran jî terefgiriya wî dike.

Ji bilî rûdana dîrokî ya murîdan, di kilamê de guherîna din ên politîk û neteweyî jî tên dîtin. Sala ku Xarzî Mihemed dimire, Mustafa Kemal Atatürk jî dimire. Hesên Nazî jî mirina wî wekî peyamekê dide ku tê de dibêje dinya ji kesî re namîne. Di varyanta Hesên Nazî de Mistefa Kemal (Atatürk) wekî “kanê baqilê dinyayê Mistefa Kemêl?” derbas dibe:

“hele gu le xu ne kanî baqilê dinyayê

siltanê payîtextê tîrka

mêrê mîna **Mistefa Kemêl**

destî xu berda ji hezn û defînê pera ji eskera wa di umyanê” (Pêvek 1).

Diyar e ku Hesên Nazî awayê ewilê kilamê ku tê de Mistefa Kemal derbas dibe, berdewam kiriye. Lê di varyantên ji salên 70-80yî vir de êdî îcrakarên din behsa Mistefa Kemal nakin û di dewsa wî de Leyla Qasim û îdama wê tê vegêran. Herwiha navên din ên wekî Xurşîd Axa û Cemîl Axa jî di varyantên din de jê diçin ji ber ku êdî kesên ku wan nas dikin gelek kêr dibin.

Têgeha adaptasyona nerît-morfolojîk (*tradition-morphological adaptation*) a Honko (1981) wê adaptasyona nerîtê îfade dike ku bi çand, nirx, rol û rewşên sosyo-ekonomîk ên civakê re li hev dike. Yek ji wan hêmanên wê cure adaptasyonê bi ser sansûrê re çêdibe. Di vê rewşê de, hêmanên jî nerîtê yên ku nayên qebûlkirin an jî êdî nayên hez kirin, cihê xwe ji bo wan hêmanên nû dihêlin ku ji aliyê civakê ve tên qebûlkirin û maqûl tên dîtin. Guherîna di navbera varyantan de ya ji Mustafa Kemal ber bi Leyla Qasimê, meriv dikare di vê çarçoveyê de bifikire. Bi taybetî di nav kurdên Suriyeyê de, bi tesîra politîzasyonê, hesta neteweperweriyê di nav civakê de xurt bû û bi demê re wê rewşa nû tesîr li vegêranê devkî jî kir. Kilamên gelêrî bi xwe (bo nimûne kilama li ser Şêx Seîd) li vê herêmê bûne amrazê xurt a neteweperwerî û nasnameya kurdî.

ENCAM

Di vê xebatê de jiyan û sermiyana Evdê Şerê û Hesên Nazî, du birayên herî navdar ên li Çiyayê Kurmênc û rola wan a li vê herêmê hate destnîşankirin û tesîra li ser nîfşên nû yên şair û sazbandên herêmê hate diyarkirin. Di çarçoveya vê xebatê de hate dîtin ku herdu birayên şair bi taybetî li Çiyayê Kurmênc û dorhêla wê bi îcrakarên din re têkiliyên xurt danîne û sermiyana xwe ya dewlemend derbasî nîfşên nû kirine. Kilamên ku wan bi xwe “îcad kirine” ketine ser devê sazband û şairên din û gelek varyantên nû ji wan hasil bûne û bi vî rengî tesîra van şairan jî li ser şair û kilamciyên hemdem û şagirtên wan berçav dibe. Ji profilên biyografîk û mîrateya çandî ya van herdu birayên şair û sazbandên pêşeng xuya dibe ku ew bes wekî îcrakarên adetî yên ji vê herêmê nayên nirxandin, herdu bira di heman demê de bi afirîneriya xwe mohra xwe li çanda vê deverê xistine û bi dehan kilamên wan ketine nav wê hewza nerîte ya vê herêmê. Di vê xebatê de herwiha hate dîtin ku ev malbat bi rengekî xurt bi hevdu re tevdigere û dawakariyên xwedîtiya kilamên bav û kalên xwe dike. Îcrakarên din ên ji vê herêmê jî dema ku kilamên herdu birayan dibêjin bi gelemperî nav û mexlesên wan (“Hesên Nazî bang kir go”) di nav kilaman de tînin zimên û heqê wan teslîm dikin. Li se vê behsê, wêneyekî çarçovekirî yê li mala Evdîlqadir Hesên Nazî de navên wan kilaman hatiye nivîsîn ku ji aliyê Hesên Nazî û Evdê Şerê ve hatine derxistin/îcadkirin. Bi vî rengî, malbat li hember serdestiya anonîmbûnê meydanê dixwaze û herdu şairan wekî afirînerên çalak ên vê çandê destnîşan dike. Ev wêneyê ku wekî mafê telifê û mulkiyeta çandî kar dike, “torê qut dike” û xetekê dikişîne di navbera kilamên malbatê û kilamên ji hewza nerîte ya bêbînî de.

(Ve)guherînen di nav varyantên kilamê de bi têgeha adaptasyona nerît-morfolojîk a Honko (1981) re li hev dikirin. Bi taybetî hin adaptasyonên kilamê de di bin tesîra polîtîsazyona civakî de sansûrê kar kiriye. Bi vî rengî hêmanên ji nerîte yên ku nayên qebûl kirin an jî êdî nayên hezkirin, cihê xwe ji bo wan hêmanên nû hiştine ku ji aliyê civakê ve tên qebûl kirin. Guherîna ji Mistefa Kemal a ber bi Leyla Qasimê di vê çarçoveyê de dikare bê nirxandin, ji ber ku di nav kurdên Suriyeyê de, bi tesîra polîtîzasyonê, hesta neteweperweriyê xurt bûye. Referansên erênî yên ji bo Mistefa Kemal ku cihê hêlane bo bi Leyla Qasim, sembola berxwedana siyasî ya Kurdistan a li Iraqê, mekanîzmayên adaptasyona fonksiyonel û ji nû ve pozîsyonkirina îdeolojîk nîşan dide.

ÇAVKANÎ

- Abdo Abdulrahman Ebdê Şaerê. البزق أكرم نازي "وعازف" || Ebdulrehman Ebdê Şaerê". YouTube. 2020, December 25. <https://www.youtube.com/watch?v=zz7DnoW6GGA>
- Alano Rewan. "Mişo Bekebûr". YouTube. 2012 March 3. <https://www.youtube.com/watch?v=popjAlopB5o>
- Blum, Stephen - Hassanpour, Amir. "The Morning of Freedom Rose up": Kurdish Popular Song and the Exigencies of Cultural Survival. *Popular Music*, 15(3), 1996, 325–343. Retrieved from <https://www.jstor.org/stable/931333>
- Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurdên Sûriyeyê*. Ankara: Wardoz, 2021.
- Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurda 1: Êpîk, Dastan*. Wien: Înstîtûta Kurdzanîyê, 2014a.
- Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurda 2: Êpîk, Dastan*. Wien: Înstîtûta Kurdzanîyê, 2014b.
- Çiyayê Kurmênc Official Mihemed Dîlber. ناحية شران المركز وقرية نازا Efrîn navçeya Şera û gundê Naza. YouTube. 2020 February 12. <https://www.youtube.com/watch?v=wIZ8P8QOdL0>
- Delikaya, Ömer. "Aşîqê Eşqê": Dengbêj û Sazbend Xalidê Xendeqa. In O. Bozan, A. Ertekin, A. Cengiz, A. Kaçmaz (Eds.), *Cumhuriyetin 100. Yılında Ergani: Din-Eğitim-Kültür*. Bursa: Ekin Yayınevi, 2023.
- Delikaya, Ömer. "Şair, Dengbêj, Sazbend û Aşîq: Nêrînek li Termînolojiya Îcrakarên Edebiyata Kurdî ya Devkî." *Mukaddime*, (16), 2025, 231–261.
- Eli, Muhammed Ebdo. *Cebel el-Kurd (Efrîn)*. Efrîn: Nediya, 2003.
- Finnegan, Ruth. *Oral Poetry: Its Nature, Significance and Social Context*. Cambridge: Cambridge University Press, 1977.
- Gültekin, Mehmet. *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. Stenbol: Avesta, 2013.
- Hamelink, Wendelmoet - Barış, Hanifi. "Dengbêjs on borderlands: Borders and the state as seen through the eyes of Kurdish singer-poets". *Kurdish Studies* 2(1), 2014, 34–60.
- Hassan Nazî. "فيديو قديم للفنان الكبير الراحل حسن نازي برفقة الفنان الراحل نوري شيخو /كولي ياري/عفرين". YouTube. 2017 September 19 <https://www.youtube.com/watch?v=3lRt7kmQIT8>
- Hatun Sürücü, Sevim. "Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera Kilamê Elî Dore". *Kurdiname*, (11), 2024b, 75–95.
- Hatun Sürücü, Sevim. "Mecîdê Hemguli: Jiyan, dengbêjî û bernivîsandina destana Mihemed Emîn (Leyla û Mecrûn)". *Kurdiyat* (10), 2024a, 41–65.
- Hemkoşer, Mihemedê Cezawir. *Bêrîvana Cindî: Çend Destan û Serhatiyên devera Efrînê (Rojavayê Kurdistanê)*. Silêmanî: Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, 2013.
- Honko, Lauri. Preface. In L. Honko (Ed.), *Textualization of Oral Epics* (pp. vii–viii). Berlin - New York: Mouton de Gruyter, 2000a.
- Honko, Lauri. Text as Process and Practice: The Textualization of Oral Epics. In L. Honko (Ed.), *Textualization of Oral Epics* (pp. 3–56). New York: De Gruyter Mouton, 2000b.
- Jinderes. "Adik Efrîn 1979 عزف نادر، عفرين، طمبور أدیک عفرین". Youtube. 2021. <https://www.youtube.com/watch?v=Q730EDv-16I>
- Jindires. "Gureşê Mêrzo, Hesnazî, کورە شی میرزو، حسنزای". YouTube. 2019b January 16. <https://www.youtube.com/watch?v=ca9WBtk4bU>
- Jindires. "Hesnazî Efrîn Kurdsat 1 کوردسات-1، حسنزای عفرین من کوردسات-1". YouTube. 2009, May 13. <https://www.youtube.com/watch?v=GOpVAmTsyxw>
- Jindires. "Hesnazî:Xwerzî Mihemed خورزی محمد بصوت حسنزای". YouTube. 2017 February 16. <https://www.youtube.com/watch?v=MU9RE-9abHPc>
- Jindires. "Xwerzî Mihemed (Îbram sal): 1970-1950". YouTube. 2021, January 4. <https://www.youtube.com/watch?v=e-u2nztUYTc>
- Kamppinen, Matti. "The Role of Theory in Folkloristics and Comparative Religion". *Approaching Religion*, 4(1), 3-12. 2014.
- Kevirbirî, Salihê. *Filitê Quto*. Stenbol: Do, 2000.
- Kritzeck, James - von Le Coq, Elinor. "Albert von Le Coq". *The Princeton University Library Chronicle*, 23(3), 115-120, 1962.
- Kock, Lars-Christian û yd. "The Berlin Phonogramm-Archiv: A Treasury of Sound Recordings", *Acoustical Science and Technology* 25, no. 4 (2004): 227–31.
- Honko, Lauri. "Four Forms of Adaptation of Tradition" in *Theoretical Milestones: Selected Writings of Lauri Honko*, ed. Pekka Hakamies and Anneli Honko, Folklore Fellows Communications 304, Helsinki: Suomalainen Tiedeakatemia, 2013.
- Le Coq, Albert. von. *Kurdische Texte*. Berlin: Reichsdruckerei, 1903.
- Lescot, Roger. "Le Kurd Dagb et le mouvement Mouroud", *Studia Kurdica*, 1–5: 101–26, 1940/1988.
- Lescot, Roger. *Çiyayê Kurmênc û Tevgera Murîdan*, (wer. Amed) Stockholm: Weşanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê, 1993.
- Lescot, Roger. *Enquête sur les Yézidis de Syrie et du Djebel Sindjar*. Beyrouth: Institut Français de Damas, 1938.
- Lescot, Roger. *Lawê Pîrê: Textên Kurdî*. Stenbol: Avesta, 2013a.

- Lescot, Roger. *Memê Alan*. Stenbol: Avesta, 2013b.
- Lescot, Roger. *Textes Kurdes*. Paris: Librairie orientaliste Paul Geuthner, 1940.
- Mahmoud & Dunia. “أكرم عبد القادر في برنامج هنرمند تقديم محمود محمد علي أرشيف رقم 90”. YouTube. 2020 July 5. <https://www.youtube.com/watch?v=xkNLMx2aKZY>
- Nadim Ado. “حلقة من تراث عفريني العازف أكرم ناز”. YouTube. 2023, December 24. <https://www.youtube.com/watch?v=FK10IiW6aCM>
- Orak Reşitoğlu, Sevdâ - Keskin, Necatî. “Rola Entelektuelên Fransî di Pêşketina Xebatên Kurdî û Rewşenbîriya Kurdî de”. *International Journal of Kurdish Studies*, 10 (2), 2024, 391–410.
- Pinto, Paulo. Kurdish Sufi spaces of rural-urban connection in northern Syria. *Études rurales*, 186, 149-168, 2010. <https://doi.org/10.4000/etudesrurales.9290>
- Schäfers, Marlene. “Tracing Connections: Kurdish Women Singers and the Ambiguities of Owning Oral Tradition”. In U. Özdemir, W. Hame-link - Martin Greve (Eds.), *Diversity and Contact among Singer-Poet Traditions in Eastern Anatolia* (1st ed., pp. 77–93). Baden-Baden: Eregon Verlag, 2019.
- Small, Christopher. *Musicking: The meanings of performing and listening*. Hanover and London: Wesleyan University Press, 1998.
- Sträuli, Barbara. “Our Steppe is Vast ...”: *Kurdish Epics and Tribal Stories from Urfa, 1906 Collected by Oskar Mann*. Wiesbaden: Harras-sowitz Verlag, 2021.
- Tejel, Jordi. “Scholarship on the Kurds in Syria: A History and State of the Art Assessment”. *Syrian Studies Association Newsletter*, 16(1), 2011, 18–29.
- Tirej Afrin. “Henanî evdê şerê لاو براوو law birawo”. YouTube. 2019a January 12. <https://www.youtube.com/watch?v=lu3KJBhIJsg>
- Tirej Afrin. “Sitrana Xwarzi Mihemed - Eli Tico بصوت الفنان الراحل علي تجو”. YouTube. 2019b March 3. <https://www.youtube.com/watch?v=06M0Hx3LU0Q&t=1117s>
- Tirej Afrin. “أغنية خارزه محمد \ بصوت الفنان رشيد مم جوجانه 1” حوار Hevaxiftinek û stranên - Reşîtê Mem Çûçanê”. YouTube. 2019c January 27. <https://www.youtube.com/watch?v=1zXP8E-vb2k>
- Wikander, Stig. *Recueil de textes kourmandji*. Uppsala: Almqvist & Wiksell, 1959.
- Yaş, Zeynep. “Eli Tico (Mihemed ‘Eli Tico)”, *Folkloru Kurdan*, (7), 2016, 46-49
- Yaş, Zeynep. *Şakarên Muzîka Kurdî-2* (1st ed.). İstanbul: Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, 2016.
- Yorğun, Tarık. “Karwan, Eşîr û Bazinbelek: Nêrînek li Varyantên Filîtê Quto”. *Kurdiyat*, (9), 2024, 39–76.
- Yüksel, Metin. Dengbêj, *Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish-Kurmanji Language in the Middle East, 1925–1960*. Chicago: University of Chicago, Doktora Tezi, 2011.
- Zeyno, Muhamed. *Dastana Şêx Seîdê Pîran: Lo Welato*. Almanyayê: SerSera, 2023.
- نازی (مقابلته مع الفنان أكرم نازی). لئحمي تراثنا العفريني (مقابلته مع الفنان أكرم نازی). YouTube. 2020 October 14. <https://www.youtube.com/watch?v=biK0ssplRJJs>

Pêvek 1: Xarzî Mihemed a Hesên Nazî

dibê mi lê hayê
hayê hayê hayê hayê lê hayê
erê erê ti nemayê
lêlkana bayê xerbê
xûşk kûr bibe dê nemîne xarzî teniya Helebê gi tê dayê ay ay ay
erê erê Xudê me' dem qeder û tebtîla min û xelkê narîn we bû
hawar hawar Xudê xeyrî te ez a xelkê narîn ra da dinyayê

[erê, saeta te xwaş!]

erê erê nabe nabe xarzî keko nabe
erê erê nabe
tu ket ber nefesê dînê
kî zalim e kî bêbexta
yek bi yekî ra bibê ocaxî te yî kûr be mala te'w xira be

erê Xudê heyfa pêxemberê ummetê
heyfa xelkê min î camêr sal dikine
dew di mi ne keko¹²
te kişande pir zehmet û pir ezîyat û pir 'ezab e

Xwedêwo Ela xera be mala hekîm û tuxtorê Helebê
top û tîfîngê Rebî Alemê lê kevê
li derdî xelkî camêr derman nedin
li sox derecê hekîm û dixtora hawar neke
şîphe li mîratmaya vê kezebê

[saet xaş!]

erê erê hawar hawar hawar
Xudêwo Ela
Xwedê tî qadir e tî mewcûd e
naka hekîm û tixtora Ela kirin micedele
derdê xelkê narîna dane xelkî minî camêr qurucax e

Xwedêwo Ela
bira bi şora bi denga li imûmê dinyê bela ba
bila bi denga
hawar Xudêwo Ela imûmê dinyê bibhîsta
naka emir cî da bahata ji Rebî Alemê da
erê erê Xudêwo bila bigotana derda mirin 'eletekê ji dinyê rabe
wexta li memleketê xerîbê xarzî kûrana Cîmê
ecêba va xebera keko kezeb û cîgera mi şewitî
fikirî ne wa mewcûd e
aqilî xalî te nekit ne deftera keko ne kitabe

[sihet xaş]

[erê]

mi go erê erê wayê
hayê hayê hayê lê hayê
erê erê ti nemayê

¹² Ev rêz tam nehate fêmkirin.

xarzî keko dilê min î bi birîne
çiqa bibêm hawar hawar
mî seh dike dinya keko talî nayê
erê erê mila we be mila we be
xarzî keko mila we be
Ela Ela Rebî Alemê bila li kesî nê qeher û nê qezebê

[saeta te xweş be]

hawar Xwedêwo Ela balê xu didê ciya û balgiya xelkî minî meqbûla
hele binire werga melûl e ya baxtreş e hawar hawar
biçîm û tedbîlê xelkê narîn binire
bejnê kilîd û kembera qirikê zêra û gerdena
farê sor û çavê belek biskê bireva
balê xu pê de di ciya û belgiya malûl e
hele binêrin vê tatê vê erebê lê

erê erê vê tatê vê erebê
Ela li ciya û balgiya binire
jî qutiyana derman û îlacê keko
bitûn îlac û derman neman li bajarê Binyê Ela
îlac û derman nema li Bêyrûd û li bajarê me yê Helebê

wey wey felekê neyarê qeda li dinyê kevê
uymîş dinyê mebin birawo taliya dinyê re
erê erê te canê kîbar ra keko çizmîşkirî
bi destê hekîm û doktora
te canê narîn da ber makîna û ber kehrebê lê

[erê]

erê erê te da ber kehrebê
xera be mala hekîm û tixtora
li derman nedî li derdê xelkî minî camêr
kirin micedele, neke şihbe li mîratmaya vê kezebê
de here xwarzî keko lêlkana bayê xerbî
mila xwîşk kûr bibe hawar dê tine bê

şîret û temiya li we bikim
ne perê pir ne malê dunyayê
ne bi camêra, ne bi xedara, ne bi çeleng e
gerek bi va dinê qut bibe batil efrût
mera hû mi neke lawina qet pê şa nebê

[çend kes bi hevdu ra dibêjin: erê erê!]
yekî din jî dibêje: weleyî dinya wer boş e!

dibê minê hayê hayê hayê lê hayê
hayê hayê hayê qederê ti nemayê lê
erê erê xarzî Mihemed keko, binirim bejnê te zirav e
herê herê nêrgize gule vê aşiqînê vê rihanê
Ela aşiqînê vê rihanê
bila h'êşin bikira li mala mezin devê taq û pencera
ay ay keko li Amûdê ber lîwanê
na wele li bajarê Heleba mîra

ay dilo ti neba li pêşiya eczexanê lê

hele ji xu ra bibînin vê ton ecêbê
bejnê kilîd û kembera ji xu ra bibînin
bejnê bala vê xelkî minî meqbûla Henîfxanê ay ay ay
erê lawina li tertîbê li biçîmê li qirûm û li êriş û li ‘elwanê
xarzî keko mirinê tu bîmrê, wextê te serê xu da kêlê kevirê
darî rehmê axî gorna, werin mina vê ecêbê
tîrsa min e ji vê tîrsê, hawar dûyî te ra xelkî meqbûle
bejnî narîn bide ber xemlê, xu bide ber darê eynê
ji kê ra çavê belek lê qeter merhemê gulîya keko bide ber badanê

[yek dibêje: saet xaş!]

[yek jî dibêje: erê!]

herê herê heyfa pêxemberê ummetê
heyfa xelqî minî camêr ra
wextê biqulibe têkevê bedîlê
wext û zemanê biqulibê têkeve zemherîrê
şixirtiyê tavan û tola ewra û birûska ay
hele binîre bi ser canê kîbar da were xar bibe
şepirtiyê topa ji ‘eniyê tew tew dilo dileva
tipitîpa dilopa berfê vê baranê

[yek dibêje: law law law!]

erê erê dibe tipêtîpê dilopê berfê bê û vê baranê
Xudê Ezraîlê mêrê kulê ra mirin wezîfa xu ye
aman û toxila bertîl û minet û rica û lawina qe nizane

erê erê Xudê hal û dilixê we be
teniya Helebê tê dana kêleka meyta bila nêzekevin
bila bibe kûrkûrê Elîf û Fîdanê
erê erê xarzî keko tim gelî xalan û xarziya gelî pismama dipirsin
mecal nema li ber mirinê axao li ber candanê

erê erê li ber mirinê keko li ber candanê
ê ti li gelî pismama dipirse
pîrs kir bajarê Bêyîrûtê li piş şebeka, li mixara, li hepsa li zîndanê
yekî şeş me hene birîndar ê sekin ji Heleba mîra anîne xestexanê
hawar ev çito li xişm û xezebê Xudê bû ji me ra
ji teşkîlet ilma murîda
xarzî tamam gundê me yî Naza
zalima şewitandin ar berdanê lê

erê erê hawar hawar gelê birano
li teşkîlet ilma murîda
gundî me yî Naza şewitandin zalima ar berdanê
wey wey dinyayê qutê
bila ji we re şîret be, ûymûşê dinyê nebin
qeda li dinyê kevi taliya dinyê qut e

hele gule xu ne kanî baqîlê dinyayê
siltanê payîtextê tîrka
mêrê mîna Mistefa Kemêl

destî xu berda ji xezn û definê pera ji eskera wa di umyanê

[erê sihet xweş]

wey wey dinyayê qutê
xarzî bila ti tebayî be mêrê mîna Xurşîd Axa
li hidûd û topraxê Turkiyê
wextê xu da hukim dikir li bajarê Îslehê, Meraşê, Bazarcixê
Keferdûzê keko bigir heta deşti dûzê ‘erebanê

wey wey dinyayê qutê
law huna loma dilî minî xwînî mekin
qeda bi dinyê kevê taliya dinyê va ay ay
keko bila ti tebayî be
simêlê reş dîregê heca meliya amirê kê îdamê dê siwanê

mêrê mîna Cemîl Axa bejnê bilind pêra fişega
qeda li dinyê kevê
xarzî ew jî mîna te yî kaur î karocax bû
hawar hawar heşeler be lawina kila çavê Zekîxanê

[erê erê erê]
[sihet xaş xalê Hesên, sihet xaş]
[sieta te xaş]




Gora Dengbêj ê Kurd Hesnazê Li Mezelê Xirabî Şera

Pêvek 2: Gora Hesên Nazî li gundê Xirabî Şera, Efrîn (Jindares Afrin, 2012).



Pêvek 3: Kesê ku di wêne de kilaman dibêje tê îdiakirin ku Evdê Şerê ye.



Pêvek 4: Eli Axayê Celemê, Mihemed Xarzî, Herba Tişrînê, Ser Dinyayê, Gulê Yarê, Hay Lê Yarê, Heseno Pis-mam, Hec Welû, Evdoyê Şerê, Narîn. Zênêbê (?)

EXTENDED ABSTRACT

This study investigates the biographical profiles and artistic repertoires of two pivotal figures in the Kurdish oral literary tradition of the Kurd Dagħ (Afrin) region in Syria: the brothers Evdê Şerê (1870–1961) and Hesên Nazî (1889–1989). Functioning both as *şairs* (oral-poet) and *destanbêjs* (epic singers), as well as virtuoso *tembûr* players, these brothers were not merely passive carriers of oral literature but active creative agents who significantly shaped the “pool of tradition” in Afrin. Despite their profound influence on the region’s musical landscape and the continuation of their legacy through familial lines, scholarly attention to their specific contributions has remained limited due to a scarcity of written sources. To bridge this gap, this research employs a methodology combining oral history, the analysis of digital archives and audio recordings, and comparative textual analysis to compile their repertoires and examine the socio-political evolution of their *kilams* (Kurdish songs).

The research situates the brothers within the context of the village of Naza, Afrin, identified as a hub for poets and musicians, and explores the robust intergenerational transmission of their art. The study details how the brothers established a “school” of performance, transmitting their skills through master-apprentice relationships to their sons, Henan and Evdirehman (sons of Evdê Şerê), and Evdîlqadir (son of Hesên Nazî), and subsequently to grandsons like Ekrem Nazî. This familial continuity allows for an analysis of “claiming ownership” in oral tradition, where the family asserts specific authorship over some *kilams* despite the collective nature of oral performance. Drawing on Marilyn Strathern’s concept of ‘cutting the network,’ the study discusses how the family demarcates individual creativity within the communal web of oral tradition by using visual artifacts—specifically framed photographs and written lists of compositions—to assert specific ownership over their own inventions (*kilams*). This visual stabilization of authorship acts as a symbolic copyright document that challenges the dominance of anonymity, establishing a definitive boundary between the brothers’ original contributions and the vast, undifferentiated pool of regional tradition.

A focal point of this article is the comparative analysis of the *kilam* titled “Xarzî Mihemed,” a joint composition by the brothers lamenting the death of their nephew. By transcribing a vocal recording of Hesên Nazî and comparing it with variants performed by successors such as Nûrî Şêxo and Elî Tico across different decades, the study tracks significant textual transformations. The analysis reveals that early versions of the lament contained specific historical markers, including references to the local Murid movement and positive allusions to Mustafa Kemal (Atatürk). However, variants emerging several decades later demonstrate a profound “ideological repositioning”. In later performances, references to Atatürk are excised and replaced with figures such as Leyla Qasim, a symbolic figure of the Kurdish political movement in Iraq.

Interpreting these shifts through Lauri Honko’s concept of “tradition ecology”, the study argues that these textual alterations are not random but are adaptive responses to the changing political sensitivities and rising nationalist consciousness of the Kurdish audience over the 20th century. The *kilam* evolves from a localized lament with specific historical references into a broader narrative of national suffering. Additionally, the study partly analyzes the *kilam* “Lo Birawo”, composed by Hesên Nazî in 1961 upon the death of Evdê Şerê, as a primary example of how the brothers used the *kilam* form to memorialize personal and communal history. Ultimately, this research establishes Evdê Şerê and Hesên Nazî as central figures in the cultural memory of Afrin, demonstrating how oral poetry functions as a dynamic archive of socio-political change.